

D

ema statuko
bidome, wê parçebûyîna
kurdan jî her wisa dom
bike û here. Dema tirk û
kurd li hev werin, wê
yekîtiya kurdan çêbe. Wê
yekîtiya kurdan li dora
Komara Tirkiyeyê çêbe...
Tiştekî balkêş e, ku kengê
PKK agirbest ûlan bike,
şerekî mezin diqewime,
em zaiyateke mezin didin,
û gelê tirk tê înfîalê...
Tê zanîn; berê jî
li Çewlikê (Bîngolê)
kemîneke ku zaiyat
gelek bûn, gelek şehîd
çêbûn, qewimîbû. Û ev
bûyer bûbû dawiya
agirbestê...
Ez vê yekê rast nabînim.
Dewlet, bi awayekî fermî
agirbestê qebûl neke jî,
divê operasyonên xwe
rawestîne, alîkariyê
bide pêla bayê aştiyê..

Rûpel 8-9



Prof. Mahir Kaynak:

**Yekîtiya kurdan
ji bo tîrkan jî bas e**

- ✓ "Amerîka ji Başûr destvala vegevê", nûçeya SAMÎ BERBANG Rûpel 3
- ✓ Nivîskarê me MİRHEM YİĞİT di nivîsa xwe ya bi navê "Rêexistina polisan dikeve
151 saliya xwe" de, li ser wesfîn teşkîlata polîsên tirk disechine Rûpel 7
- ✓ "Ne dereng e!" OSMAN ÖZÇELİK bi vî sernavî gazî gel dike û dibêje wan: "Tirsê bişkînin" Rûpel 13



1998, wê bibe sala
rojnamegeriya kurdan

6



Neynika şaristaniya
hemdem ziman e

7



"Eksresa Aştiyê"
ji Stenbolê bi rê ket

11

Ji — Xwendevan

EM li derketina rojnameya me, silav dikan. Em çiqas bêjin, "Hêviya me, ve neqetîna me û we ye" ji, hovîtiya dijmin a li ser çapemeniyê wê bidome. Ji ber vê yekê em ji Azadiya Welat re ji, hêviya domandinê dixwazin.

Em wisa bawer in ku pênişa Apê Mûsa li erdê namine û Azadiya Welat, di yekbûn û xurtkirina zimanê me yê neteweyî û rastiya gel de rista xwe ya giring bilize.

AHMET HÜSEYN
MURAT KAYA

JI mêt ve em li hêviya Azadiya Welat bûn. Girtina "Welatê Me" ji bo zimanê ku dî, çanda kurdî, çapemeniya kurdî kemasîyeke mezin bû.

Baweriya me ew e ku Azadiya Welat cihê vê kemasîyê dagire û Azadiya Welat zexmtir û mezintir derdikeve û belav bibe. Mezinbûn û zexmbûna rojnameya me bi destê me ye. Em rojnameya xwe her dem bikirin, bixwînîn û bidin xwendin.

Daxwaziyeke me ji we heye ku hûn di rojnameyê de zedetir li ser ziman û rezimana kurdî bisekinin, bîryar û lêkolinén ku li ser ziman, reziman û tîpen kurdî têne dayîn û çekirin, hingî ji dest we tê, biweşînin...

JÎNDAR Û BÊRÎVAN / ENQERE



Aştîxwaz kî ne, şerxwaz kî ne?

MEHMET GEMSİZ

Li Rojhilata Navîn, gel tî û birçiyê aştiyê ne, hewcedarî jîneke rûmetdar û bi aram in. Ji bo ku bigihîjin wan armancan, jîna xwe jî feda dikan. Ma şoreşgerek wiha negotibû: "Em ji jiyanê bi qasî ku em dikarin di oxira wê de bimirin, hez dikan."

Li vê cografayê tu gel bi qandî kurdan êş û jan nekişandiye, wekî wan welatê wan nehatîye parçekirin, wekî wan, malbat jî tê de, ji hev nehatîne qetandin. Ji destpêka sedsala 19'an bi vir ve bêrawestan ji bo serbestî û şerxwebûna xwe û gelê xwe li hemberî hêzên ku welatê wan vegirtine têdikoşin. Heta, ji bo ku karibin li jiyanê bimînin li ber xwe didin.

Kurdan li başûrê welatê xwe, li rojhilatê welatê xwe û li bakurê welatê xwe li dijî stem, zor û kotekiya dijminen xwe dest avêtin çekê û li wan rabûn.

Tim tê gotin, divê dîsa bê gotin ku gelê kurd her tim ji aştiyê re, ji xweşikahiye re hebûye û amade bûye. Ev yek daye sel-

mandin ji.

Di sala 1993'yan de, PKK'ê ji bo ku meseleya kurdan bi xweşikahî safî bibe, agirbest ûlan kir. Lê ci bû? Şerxwaz, di wê demê de jî bi ser gel û gerîla de çûn. Ew kuştin, gund û jîngeh tarûmar kirin. Agirbestê zêde dom nekir, jîxwe nikaribû bidomiya. Şer gur bû. Dîsa mirov hatin kuştin, gund hatin valakirin. Siruşta welat hate hilweşandin. PKK'ê dîsa di 15'ê berfanbara 1995'an de agirbest ûlan kir. Heta niha, digel operasyonên dewletê, didome. Careke din xuya bû ku kî şer û kî aştiyê dixwaze, hem jî li hemberî raya giştî ya cîhanê.

HADEP'ê di 21'ê avrêlê de li Stenbolê mitîngêk pêk anî, bi navê "Mitînga Aşîfî Demokrasiyê". Ji 50 hezarî zêdetir aştiyaz besdar bûn. Tiştekî cihêreng ku, digel dayikên gerîla, dayikên leşkeran ji hatibûn û li hemberî şer helwesta xwe dan nîşan. Eynî roj "Trena Aştiyê" ji Stenbolê berê xwe da Amedê. Li Amedê nêzîkî 20 hezarî mirov bi leqayî wan ve

çûn. Polis li seriya 100 kesen ku çûbûn pêşîya aştiyazan, girtin.

Pîşî van gotinan, divê mirov piçekî li ser wesfîn aştiyaz û şerxwazan bisekine. Ka aştiyaz bi ci û şerxwaz jî bi çiyêne xwe tênaşîn? Hema em bi kurtî dikarin van bibêjin: Aştiyaz mirovhez in, maşparêz in, hawîrparêz in, wekhevîxwaz in. Cudatiyê nakin naybera mirovan ku ew ji ci nîjad, ol, ziman û rengî bin. Li hemberî şer in. Ew dizanîn ku şer çiqas bêrehm û sotîner e. Alîşirên xweşikahîye ne û baweriya wan ew e ku, her tiş dema bê xwestîn, bi diyalogê dikare hel bibe...

Şerxwaz jî li hemberî wan daxwazî û ramanen aştiyazan in. Çavşor in, maf, hiqûq û qanûn li cem wan nîn in. Kedxwar û mijok in. Wekî zêlû (zérû) û qijnikan in; jîna wan bi xwînê ve girêdahî ye. Hebûna wan bi talan û kuştinê ye. Her wiha ew daxwaz û ramanen xwe, ne bi xwe, bi kesen din didine kirin. Kesen reben, jar û xizan fişekên tivingen wan in.

Di dawiyê de em vê bibêjin, li aliyeşî heqî û li aliye din jî neheqî, her du li ba hev û li dijî hev in. Pêla aştiyazan gava ku rabû pêdarê û ew kesen ku bûne peyayen şerxwazan ji wan qetian, serfirazî gengaz (mimkun) e.

Êdî kurd gîhîştin namûsa xwe

MUHEMED MUHEMED

Namûs; meseleyeke bi taybetî girêdayî mirov e. Ji ber ku, bi mirov re zanebûn, fîmkirin, his û civakî heye. Di sewalan de girêdanek civatî bi zanistî tune ye, namûs jî bi sewalan re nîn e. Civaka Kurdistanê, gelekî bi namûs û şerefa xwe ve girêdayî maye. Lê çawa ev namûs daye parastin? Hemû namûs û şerefa xwe bi ku ve girê daye? Divê mirov van pîrsan baş nas bike û sedemîn van ji hev veqefîne. Da ku baba me baş were nasîn.

Li ba gelê Kurdistanê bi taybetî gava mirov pîrsa namûsê dike, di cih de pîrek û malbat tê hişê mirov. Gelê me rûmeta herî mezin ji aliyê namûsê ve dide pîrekê. Lewre vî, ji xwe re her dem li pêş didîtin. Welatekî ku, ji hêla dijminen biyan ve hatibe dagirkirin, sererd û binerd û hemû hebûna wî welatî were talankirin, namûsa wî gelî ji tê qirêjkirin. Mîna gelê kurd ê ku her tişte wî hatîye dagirkirin.

Bi vî rengî, gelê ku dev ji namûsa rastî berdabû, bes namûs pîreka xwe didît. Çiqas dijmin dihatin Kurdistanê xwe eşkere nêzîkî malbat û pîreka kurdan nedikirin. Lê ji aliyê din ve hemû dewlemendiyen Kurdistanê ji xwe re res dikirin û dibirin. Gel, li hemberî vê bêdeng dima. Lê belê, ger mirovekî kurd bi pîrekê re baxiviya an jî lê mîze bikira, dibû sedema kuştina hev û din. Gava leşkeren dijmin qirêjî bi pîreka wan bikira, tu kesî deng nedikir.

Dagirkiran ji lawaziya kurdan baş nas kiribûn, ev lewazbûna kurdan ji xwe re bi kar dianîn. Gel jî bi rastiya

Derketina PKK'ê bi xwe re namûsa netewiyetê derxiste holê. Bi rengekî zanebûn li ser bingeha sosyalîzma zanistî pirsgirêka doza pîrek û namûsa mezin, bi gelê me da zelalkirin.

namûsê nehisiyabû, ji ber ku bêpêşeng, bêbirdozî, bêzanebûn û bê yekbûn mabûn. Pişî ku ew qas civaka Kurdistanê ji rastiya namûsê dûr ketibû, kes jî ew qas hatibû biçükirin. Ji ber vê yekê ji, kesî nikaribû ji bo namûsê ristekî mezin bilista. Ji ber ku gelê Kurd ji hemû tiştan bêpar mabûn. Gava gelek bi armanê biçük ve hatibe girêdan, ew jî biçük difikire. Wê demê jî li ser berjewendiyê civakê nikare bilind, fireh û tiştîn xurt bifikire, û ne jî keç û xortên welat dikarin bi vatîniya (wezîfe) mezin, ji demê pêş ve rista xwe bileyîzin.

Derketina PKK'ê bi xwe re namûsa netewiyetê derxiste holê. Di nava gel de tiştîn rast û şaş hatin nasîn. Partiyê bi rengekî zanebûn li ser bingeha sosyalîzma zanistî pirsgirêka doza pîrek û namûsa mezin, bi gelê me da zelalkirin. Bi taybetî kurdan xwedîti li pîrekê dikir. Lê wan rastî çiqas didan meşandin?

Êdî ew namûs û şerefa ku dagirkiran nîşanî gel dabû û bi gelê me dabû fîrkirin, parti bi bîrdoziya xwe ya şoreshîr û mirovatî diyarî gel kir. Her kesî dît ku namûs û şerefa mirov bi ci ve girêdayî ye. Di hundîre demeke kurt de gelê me ew ehleq û namûsa dijmin ya ku bi hezar salan dabû avakirin, xistin bin lingan. Pişî ku naskirina gel ji têkoşîna neteweyî re çêbû, şerîkî gir li hemberî kesaniya xwe da meşandin û hem jî li hemberî dijmin bi kar tîne. Ev

rewş jî, li ber çavan e. Ji ber vê jî, dijmin bi hemû derfer û imkanen xwe

(tank, top, çekêne giran, şerît taybetî) li dijî gel dide xebitandin. Lê gel qet dev ji welat û ciyayen xwe bernade. Bi neynokan, axa xwe diparêze. Ji ber ku tê gîhîşt ku welat namûs e, hebûna wî ye, rakirina ser piyan e, parastin û xelasîya wî bi xwe ye. Dijmin di vir de mirina xwe baş dibine, her çiqas êrşî dibe ser kurdan, dest diavêjin namûsa pîrekê, lê gel qet ji berxwedana xwe bi şûn ve venagere.


Dagirkiran KT'ê ya faşist dixwaze mîna berê lawazîyen kurdan bide xebitandin. Da ku dîsa gelê kurd bide xapandin û ji riya şoreshîr vegevîne. Weki ku rojekê keçke şoreshîr dikeve destê leşkeran, leşkeren faşist jê re wiha di bêjin: "Get tu cihê hevalen xwe nişanî me nedî, emê namûsa te xera bikin" Ew keçika şoreshîr bersivê, wiha dike faşîstan: "Namûsa min ne pîrekî ye, namûsa min welat e." Ev berxwedana xwe bi şûn ve venagere.

Her ku gel namûsa welat nas bike; bi welatê xwe ve tê girêdan, girêdanek zanebûn tê afirandin, ev jî, ji azadi û rizgarkirina welatekî serbixwe re dike bingehêke dîrokî. Bi kurtasî dîrok dide xuyakirin ku, gelê bi namûsa welatê xwe ve girêdayî bimîne wê tim xwedî rûmet û şerefeke giranbuha be, di nav civaka mirovatîye de.



Li NÇM'ya ïzmîrê çalakiyên çand, huner û ramyarî gur dibin. Roja 20'ê avrêlê bi besdariya nivîskar û siyasetmedarê kurd Osman Özçelik li ser Cegerxwîn gotûbêjek çêbû. Özçelik da zanîn ku Seyda Cegerxwîn helbestvanekî mezîn e. Wî got: "Carinan dema mirov rewşa hin kurdan dibîne, mirov ji kurdbûna xwe şerm dike. Lê dema mirov Cigerxwîn nas dike, mirov bî kurdbûna xwe şanaz dibe."

Dîsa heftiya çûyî, bi besdariya nûnerê HADEP, ÖDP, EP û SIP'ê polîtikaya partîyan pêşverû ya çand û hunerê hate niqaşkirin. Besdaran nêrînê partîyan pêşkêşî temaşevanan kirin.



Kedkarêñ Tirkîyeyê ku rewşa wan a aborî her roj xerabtit dibe, xwe amade dikin ku cejna 1'ê Gulanê bi girseyî pîroz bikin. Li Stenbolê du serîlêdanen jî bo pîrozkirinê pêk hatin. Li aliye sendîkayê wekî Türk-İş, DİSK, HAK-İŞ û KESK'ê jî bo cejnê li meydana Kadıköyê pîroz bikin serî li walîtiya Stenbolê dan.

Li aliye din bi pêşengiya SIP'ê hin kesan jî bo meydana Taksimê ku wekî Meydana 1'ê Gulanê jî tê binavkirin, ji walîtiyê destûr xwestin. Her wiha li gelek bajârên din jî derdorê demokratik ji bo pîrozkirina 1'ê Gulanê amadekariyê dikin. Tê hêvîkirin ku îsal daxwazîn demokratik û dirûşmeyen jî bo aştiyê derkevin pêş.

NÛÇE

Amerîka ji Başûr destvala vegerî

Piştî peymana PKK û PDK'ê, têkiliyên PDK û YNK'ê başdır bûn. Lê ji ber ku hêzîn kurd ên başûrî ne bi serê xwe ne, pêkhatina peymana aştiyê hêsan xuya take.

Heyeteke Amerîkayê heftiya çûyî li başûrê Kurdistanê bû. Ev heyeta di bin seroka-tiya Berpirsê Karê Kendavê yê Sekreteriya Karê Derve yê Amerîkayê Robert Deutsch de, li başûrê Kurdistanê ji bo lihevanînê bi rayedarên PDK û PPK'ê re hevdîtin çêkirin. Lê bêyî ku ew tiştekî bi dest bixe, ji herêmê veqefî. Di nava heyeta Amerîkayê de du endamên MİT'a tirk jî cih girtin.

Li gorî agahiyan, heyetê pêşî roja 23'ye avrêlê li Hewlîrê bi Serokê YNK'ê Celal Telabanî û dû re jî li Selahadînê bi Berzanî re hevdîtin çêkirin. Mijarîn ku li ser gotûbêj çêdîbin bi taybeffî, meseleya kişandina hêzîn çekdar ji Hewlîrê û parvekirina pereyên gumrîk ye. Li gorî hin çavkaniyan her sal ji deriyê Xabûrê 70 milyon dollar tê.

Her wiha Tirkîye dixwaze xaleke ewlehiya sînorêne xwe jî bixe nava peymana hêzîn kurd. Lê, her du partîyen kurd naxwazin tiştekî wisa di peymanê de cih bigire, ji ber ku xaleke bi vî ren-ge dibe sedema pevçûnê di navbera wan û PPK'ê de.

Li hemberî daxwaza komara tirk, hêzîn kurd diyar kîn ku dema federasioneke demokratik pêk were wê, hîkûmeta federalî karibe ewlehiya sînoran pêk bîne. Gotinê Talebanî yên bi tengê "PKK tevgereke siyasiye", gelekî deng vedan.

Divê bê zanîn ku tevî Tirkîyeyê, Kongreya Neteweyî ya Iraqê (INC) jî

federasyonê naopejirîne. Ev rîexistin wekî sîwanekê ye ji bo hêzîn dijber ên Iraqi. Serokê INC'ê Ahmed Çelebî idia kir ku, kurd bi serê xwe nikarin biryara tiştekî wisa bidin. Li gorî Çelebî hemû gelê kurd federasyonê dixwaze, ancax biryara di vî warî de divê bîmîne piştî hilweşandina rejîma Saddam.

Derdorêni siyasi vê hewldana Dewletê Yekgirtî yê Amerîkayê (DYA) wekî çalakiyên bi destxistina inisiyatîfa ku piştî civînên Dublinê ji dest çûyî, dinirxînîn. Wekî tê zanîn Amerîkayê par nûneren her du rîexistinê kurd li paytexta ûrlandayê Dublinê civandibûn, lê ev civîn negîhîstibûn tu encamê. Wekî sedema sereke ya têkçûna van civînan, Tevgera Brûskî ya ARGK'ê tê nîsandayîn. Li aliye din helwesta welatên wekî Iran û Sûriyê jî, çavê PDK û YNK'ê tirsand.

Piştî van civînan, Iranê dest bi çalakiyan kîribû. Her çiqas çalakiyên Iranê di navbera her du hézan de peyman pêk neanîbe jî, bandora vî welatî li ser başûrê Kurdistanê zêde bûye. Li gorî idîyan peymana ku di navbera PPK û PDK'ê çêbû jî, bi xebatên peywîrdarê taybet ê Serokwezîrê Iranê Haşimî Rafsançanî û Aga Mohammed çêbûye.

Tevî ku PDK ji tîrsa Tirkîyeyê hebûna peymana bi PPK'ê re naopejirîne jî, ew dide zanîn ku naxwaze ji bo berjewendiyêni Tirkîyeyê bi PPK'ê şer bike. Lewma jî hem PDK, hem jî YNK "Emê PPK'ê bi riya diyalogê ji herêmê



Serokê YNK'ê Celal Telabanî û Robert Deutsch, bi hev re têne dîtin.

derxin", dibêjin. Li gorî çavdêriyan, Amerîka jî ev yek pejirandîye.

Li aliye din gelek bawer nakin ku wê kes karibe PPK'ê ji başûrê Kurdistanê derxe, ji ber ku wê êdi li herêmê cihê xwe qewî kiriye. Bi awayê ku tê gotin, di peymanê de PDK'ê rê daye PPK'ê ku, li herêmâ di bin kontrola wê de du bargehêne leşkerî ava bike.

Di polîtikaya Tirkîyeyê de, ya li ser vê mijarê, aloziyek xwe dide der. Li aliye sendîkayê wekî dixwazin hêzîn kurd bi Saddam re li hev bîne; wekî ku xwe nêzî dewlettîn herêmê dike nîşan dide, li aliye din li hemberî welatên ereb diçe bi Îsraîl peymanan çêdike. Di politikaya dewleta tirk de tişte diyar, nexwestina statuteye ji bo kurdan e. Di vî warî de gelekî hişk e. Serokê artêşa tirk yê "kevn" Doğan Güreş, dide zanîn ku wan di MGK'ê de biryar standiye, heke Kurdistan ava bibe, ewê bi şer ji holê rakin.

Dewleta tirk li hemberî PPK'ê hêviya xwe bi tunekirina statûya başûrê Kurdistanê ve girê daye. Ev bi plana Serokê DSP'ê Ecevit zêdetir eşkere bû. Ecevit dixwaze ku kurdan ji nû ve bixe bin desthilatdariya Saddam. Ji Wezîrê Berevaniyê Altan Sungurlu bigire ta Serokê Artêşê yê "kevn" Doğan Güreş gelek rayedarên dewleta tirk dixwazin PDK û YNK bi Saddam re li hev bê. Lê niha her du hêz jî didin zanîn ku, ewê bi Saddam re li hev neyên. Serokwezî-


rê Hikûmeta Federal Kosret Resûl, diyar kir ku bi faşîstekî wekî Saddam bawerî nayê.

Rewşa ku niha hêzîn başûrî tê de ne, gelekî balkêş e. Piştî peymana PPK û PDK'ê, têkiliyên PDK û YNK'ê başdır bûn. Yanê ji bo yekîtiya neteweyî merc baş bûn. Lê ji ber ku hêzîn kurd ên başûrî ne bi serê xwe ne, pêkhatina peymana aştiyê hêsan xuya take. Hêzîn derveyî her yek dixwaze li gorî berjewendiyêni xwe, xalekê bixe náva vê peymanê. Yanê Amerîka wan bi aliye-kî ve, Tirkîye bi aliye-kî ve û Iran-Sûriyê bi aliye-kî ve dikişîne.

Berî ku heyeta Amerîkayê here herêmê, weşana Kongreya Neteweyî ya Iraqê El Mutabar dabû zanîn ku, YNK û PDK'ê li ser hin xalan li hev kirine. Di weşana INC'ê de jî hatibû gotin ku her du hézan ev xal pejirandîne: Şerê ku bi navgînê ragîhandinê (radyo, televizyon, kovar, rojname) tê kirin, wê bê rawestandin; her du alî wê dîlêni di destê xwe de berdin; wê dawîyê li girtina endamên hev bînin û wê cûm-hatîna di navbera herêmêni di bin destê her du aliyan de, serbest be.

Lê dîsa jî heyeta Amerîkayê nikaribû peymanê bi wan bide imzekirin. Li gorî agahiyan parvekirina pereyan û helwesta li hemberî PPK'ê li ber wan bûne asteng.

SAMÎ BERBANG



Nexşeya Kurdistanê

Eşq li Kurdistanê

dest pê dike (2)

GÜRDAL AKSOY

Li ser vê bingehê, mirov dikare, der barê fitkirina Şeytan a ji bo daxwarina sêvê bi Hawayê de, şiroveyeke cinsi bîke. Jixwe wisa jî hatiye kîrin; her wiha, di Tevratê de jî tê gotin ku, piştî ku Hawa ji bo dinyayê hate birêkîrin, wê serê mar biperçiqîne, ev yek ji aliyê hin kesan ve mîna ku mar, yanê Şeytên doza bavîtiyê li zarokê Hawayê kîrîbe, tê şirovekîrin(15). Çunkî mar, dîsa ji aliyê hin kesan ve xoşewîstê (yar) Hawayê yê yekemîn û bavê kurê wê Kabîl e(16). Li gorî Tevratê, piştî ku Adem û Hawa sêvê dixwin, bi tazîbûn û cinsiyeta xwe dihesin. Li ser pêşniyaza mar, ji ber ku pêşî Hawa ji sêvê xwariye, pêşî ew bi cinsiyeta xwe dihese. Ji ber vê yekê jî, mirov dikare bifikire ku mar agahiya cinsiyetê daye Hawayê(17).

Dara sêvê, ji ber ku tevî cinsiyetê, jiyanê jî ifade dike, bixwazî nexwazî, zayîn û hemlemayînê jî tîne bîra însanan. Li gorî ku Frazer diyar dike, Kirgîzên Reş jî, jînên hişk (ne zayok, kîsîr) ji bo ku bi hemle bîmînin (yanê zarokan bîmînin), bi serê xwe li bin dareke sêvê,

kê dareke pîroz ji xwe re cil û berg çedikirin, bawer dikirin ku ev dar wê wan ji talûkeyen ku di dema welidandinê de derkeve pêsiya wan, biparêze. Çiroka Letoyê ku di dema welidandina Apollon û Artemis de, xwepêçandina li dara palmiye û dara zeytûnê an jî du darê defneyê, belki jî li baweriya yewnanan a di hêskirina welidandinê de tesîra daran işaret dike(20).


Dîsa, li hin herêmên dinyayê, li giyayan bi çavê jînên bi hemle dihat nihertin. Frazer, bi vê yekê re eleqedar mînakan dide. Ez zen dikim ku, rolêni bi vî rengî yên giyayan, ji ber ku giya sîmgeyeye makxwedayan a kû jê tê hezkîrin e. Bi rastî jî dar, li vê derê ji ber ku tê maneya jiyanê jî, ew jî, eynî mîna mar ku jiyan, zayîn û bereketê ifade dike, sîmgeyeye populer a makxwedayan bû. Belki jî ji ber vê yekê, ev her du hêmanên sembolik (mar û giya/dar) hema di her gotegetê de bi hev re cih digirin. Bi taybetî giyayê jiyanê an jî dara jiyanê hema bêje bêmar nedihat tesewûrkîrin. Mesela Gilgameş, çawa giyayê jiyanê dîtiye nediftiye, marekî ew zeft kiriye û reviyaye. Di mîtolojiya İbrâniyan de bûye marê baxê îrem (bexçeyê cenetê) (24). Em wisa zen dîkin ku di destana kurdan a Memê Alan de jî, sêv di maneya nemir de ye. Di destanê de, Xoce Xizir sêvek daye yek ji se birayê kurd ku li hev rûniştine û dirîn, da ku wan teskîn bike(25).



Muhra Sumerên kevn.

xwe li erdê digindirandin(18). Dîsa li gorî ku em ji Frazer hîn dîbin, hem li Swêdê hem jî li Afrikayê, hêza ku welidandina jinan hêsan dikir, bi darê ve dihat girêdan(19). “Li hin herêmên Swêdê, berê nêzîkî her “çiftlikê”, “barträd” an jî dareke parêzger (ixlamûr, benav an jî dara reş) hebû. Tu kesî nikaribû ji pelekî vê dara pîroz hil bîke, xesarek ku lêbihata kîrin, bi bêyomî an jî bi nexweşînê dihat cezakîrin. Jinên bi hemle ji bo ku bi rihetî bikarîbin biwelidînin, çepîlên xwe li darê dîpêçan. Li herêma Kongoyê di hin qebîleyê reşikan de jînên bi hemle, ji qali-

gî mirov rast tê. Dara sêvê, li vê derê tevî ku dara jiyanê jî ifade dike, divê mirov peywendiya mar û dara sêvê jî fêm bike. Mesela gelê Cermen ê kevn, bi wê dara jiyanê ku aîdê jîna xwedê Bragi xweda Iduna bû û ji aliyê ejdirhayekî ve dihat parastin, diperisi(21). Dihat bawerkîrin ku, ev sêv ciwantiyeye ebedî didin Aesirê. Grekan jî, bawer dikir ku dara sêv a ku li bexçeya Hesperidesê ye, ji aliyê ejdirhayekî ve tê parastin(22). Dîsa di destana Gilgameşê de, behsa Humbabayê ku parêzgerê daristanê sediran û mîna mehlûqatekî dîv e, tê kîrin. Destnîşankîrin vê da-



Sehneya ajotina zeviyê. Ew ji muhreke gilower a ku ji Nîppurê derketiye, hatiye wergirtin. Ew niha li University Museumê ye.

ristana sedirê, mîna cihê ku xweda Istar (Sumer. Inanna) lê dijî, bi mane ye(23). Li ser sembolizekîrin makxwedayê bi mar û giyayan, em mînakekê bidin ku ev bi mijara me ve jî gelek girêdayî ye. Li Babîlê di taswîrkîrin pêşin a Istarê de (Sumer. Inanna), Istar, bi mar, çicekîn bi gupik û çîmenên zirav û dirêj hatiye nîşandayîn. Heta Istar, wekî marekî ku xwe li qurnê darê pêçandiye, hatiye taswîrkîrin. Li gorî ku James Hall jî diyar dike, ev, dû re di mîtolojiya İbrâniyan de bûye marê baxê îrem (bexçeyê cenetê) (24). Em wisa zen dîkin ku di destana kurdan a Memê Alan de jî, sêv di maneya nemir de ye. Di destanê de, Xoce Xizir sêvek daye yek ji se birayê kurd ku li hev rûniştine û dirîn, da ku wan teskîn bike(25).

Sêv wekî fêkiyekî ku kêfa Istar jê re tê, derbas dibe. Istar wekî marê baxê îrem tê binavkîrin û tê qebûlkîrin ku xweda eşqê ye. Mesela, di duayekê Babîlan de ev tiş balê dikişîne: “Jina herî bedew, eşq afirand! Istarâ ku kêfa wê gelek ji hinar û sêvê re dihat, arzû afirand!”(26). Jixwe, di Sumeran de sêv mîna fêkiyekî pîroz dihat zanîn. Di şîreke Sumeran de ev rastî bi vî awayî hatiye diyarkîrin: “Dara sêvî piştî ku çîcek vedike, piştî ku fêkiyê wê tê dîtin/ Fêkiyê wê ançax layiqî xemilandîna perestgehêne yezdanane e”(27).

Li vir, divê ez qala wê figurasyona ku di muhra Sumerên kevn de ye bikim û ew figurasyon wekî sembola gotegeta ji bihuşte qewirandina Adem û Hawa tê binavkîrin. Ev teorî, ji aliyê George Smith (The Chaldean Account of Genesis, 1876) û Stephen Langdon (Semitic Mythology, rpl.179) ve tê bipêşvebirin, lê, ji aliyê Joachim Menant (Recherches sur la gylique orientale, bes.I, rpl.189–91) û Ward (The Seal Cylinders of Western Asia, rpl.138–9)

ve jî, hatiye redkirin(28). Fikra Joseph Campbel jî wisa ye: Ew muhra Sumerên kevn, “mîna ku hin zanyar zen dîkin, ne şiroveyeke Sumeran a windayî ya gunehêne Adem û Hawa ye”(29).

Li gorî Kitêba Pîroz, Adem û Hawa piştî ku ji fêkiyê wê dara ku tê gotin dîra agahiyê û ebediyetê ye dixwin, êdi digihîjin zanebûna ferqiyeta bas û xerabiyê. Li gorî min, divê mirov ji vê, bi taybetî gîhiştina wan a ferqiyeta (di navbera însanan de) xweşik û nexweskîkbûnê fêm bike. Çunkî, jixwe beriya medeniyetê jî, hin nîrxên însanan hebûn û bi xwezayî ev jî li ser baş û nebaşbûnê bûn. Jixwe di dîroka olan (dîn) de baş her tim xweşik, xerab jî her tim nexweskîk hatine qebûlkîrin. Adem û Hawa bi xwarina sêvê, ji aliyekî ve gihiştine xwenaskîrina mulkbûyî û ji ber vê yekê jî li gorî gotegetê jî cara pêşîn tazîbûna xwe ferq kirine. Li vê derê, heke em ifadeya John Berger bipejîrin, em dikarin bibejîn ku, esas Adem û Hawa hevûdin ne tazî, belki bi awayekî ‘nu’ dîtine. Çunkî tazîbûn, li gorî Berger xwebûna însan e; ‘nu’bûn jî ji kesen din re tazî xuyabûn e, yanê ne fîkirîna xwebûna însan e. Ji bo ku wicûd bibe ‘nu’, divê wekî nesne were dîtin(30).

Li gorî vê ferqîtiyê, Adem û Hawa dema xwe ‘nu’ dibîn, bi nuxumandînê cinsiyetiya xwe kêm zêde vedişîrin. Bi şeklê ku di gotegetê de dibore, pelên hejîran datînin ser organên xwe yê cinsî (ne belî ye çawa) û xwe dinuxumînin. Ji ber vê, bi awayekî sembolik, Adem û Hawa cara yekemîn bi veşartîna wicûdên xwe, xwe nependî dîkin û tova eşqê jî ku çeşneke fetîşizma mulkzanînê ye, diavêjin. Belê bi rastî jî, perdeya bedena mulkbûyî, ku bi xwe jî mulk e amadekarê hêmaneke eşqê ye; ew hêman jî sir e. Çunkî cil, bi vî awa-

yî rê li ber dîtina rastiya li ber çavan di-gire û şîûra me, şîûra me ya li ser cinsi-yetê şêlo dike. Ev rews, hinekî jî xiz-meta jihevderxistina xweşikbûn û nex-weişikbûnê dike. Li vê derê, ez mecbûr im ku vê nota enteresan diyar bikim: "Milekî ola Hindi Ceyni, Dicembera, ewqas li dijî mulkiyetê ye ku, endamên vî olî mulkbûneke di radeya (derece) veşartina cihê edeb û heyâ bi paçikekî de jî, qedexe kirine. Alîgirê vê mezhe-bê, dûrî cih û warêñ dêmanî, li darista-nan cip û tazî dijîn"(31).

Adem û Hawa, wekî me berê jî goti-bû, şexsiyetê symbolik ên civakêñ ku wan pêşî dest bi çandiniyê kirine ne. Ji ber wê yekê, mirov dikare bîbêje ku ev şexsiyetê mîtolojik, esas însanêñ Ne-olitik (Çaxa Kevirê Nû) an jî dewra tarîxi ku mîna Dewra Kevirê Cîlakirî jî tê zanîn, sembolize dikin. Di Dewra Kevirê Cîlakirî de rûdana pîşeya çolan-gî (dokumacılık), li vê derê, hinek jî li naveroka gotegetê tê(32). Lewre, ji wê dewra tarîxi û pê ve, cilêñ ku ji hirî û ji kitanê çêbûne, bi dawikêñ (etek) ji pe-lan an jî bi cilêñ ji çermê çêbûne re ke-tine pêşbaziyê (33), mulkiyetbûna wi-cûd û zêdebûna nuxamtinê di eynî de-mê de pêk hatiye.

Gelo, sedema nuxmandinê, mîna ku di gotegetê de tê eşkerekirin, hesta şermkirinê ye, an jî ji sermayê xwepa-rastin e? Li ser vê mijarê fikirêñ cihê cihê hene. Li gorî Will Durant, "Wisa dixuye ku, di destpêkê de cil, di cihê xweparastina ji sermayê, an jî nuxamti-na cihê edeb û heyayê de, wekî şeşne-ke xemlê, astengiyeke li ber têkiliya cinsî an jî ji bo zêdekirina cazibeyê hatiye bikaranîn. Cimbriyan, bi awayekî tazî bi taxokan li ser berfê xwe dişemi-

i Pîgmeyêñ Afrîkaya Navîn de, hem mîr hem jî jin, li malêñ xwe yêñ li daristanê tazî dijîyan, lê li ber kesêñ biyan, xwe hinekî dinuxumandin. Buşmenêñ Afrîkaya Başûr jî, bi parçeyekî çermîn, ji xeynî nuxumandina paşıya xwe, tazî digeriyan.

tandin. Dilê Darwin bi Feugian'an di-şewite, ji bo xweparastina ji sermayê paçikekî sor dide yekî; xwecihî jî, wî paçikî tavilê dike parçeyen piço piço û li hevalen xwe belav dike û tev jî wan paçikan ji bo xemlê bi kar tinîn"(34).

Di kitêba Westermark a bi navê "În-san Evliliğinin Tarihi" (Dîroka Zewaca Mirovan) de tê nivîsandin ku, di gelek civakêñ hovebar de jin û mîr şîlf û tazî bûne. Hin qebileyen ku bicil bûne jî, bi hin baweriyan ve girêdayî ne. Mesela, di qebileya Kamerûnê ya Balf û di hin qebileyen din de, mîr, bi baweriya ku çavêñ xerab (evil eye), dibin sebeba ji mîrtiyê ketinê, xwe dinuxuman-din(35). Di hin qebileyan de jî, jinêñ zewicî xwe dinuxumandin, jinêñ ezeb (nezewicî) ji bi temamî tazî bûn(36).

Xwenuxumandina jinêñ zewicî cari-na pişti ku nuxuriyê (zarokê pêşîn) xwe diwelidandin, pêk dihat(37). Sebeba vê jî, her hal xwe li hemberî talûkeyen hê-zîn di ser xwezayê re parastin, yanê ji bo ku tu zerar di dema hemlebûn û we-liandinê de negihîje wan, bû(38). Li gorî ku Westermark diyar dike, di herê-mîn bakur ên Kaliforniyayê de, hem mîr hem jî jin tazî bûn. Di nav Mîwo-kan de, jin û mîrên di her temenî de bi temamî tazî bûn(39). Dîsa, hin gelêñ ku

di Okyanûsyaya Pasîfîk de jiyane, hin qebileyen li Borneo û Sumatrayê, li nê-zîkî "Împaratoriya Sîamê" gelê Jaraî û di nav Nagayêñ Assamê de, her du cins jî an bi temamî tazî bûn an jî xwe gele-kî hindik dinuxumandin(40). Di Pîgmeyêñ Afrîkaya Navîn de, hem mîr hem jî jin, li malêñ xwe yêñ li daristanê tazî dijîyan, lê li ber kesêñ biyan, xwe hinekî dinuxumandin. Buşmenêñ Afrîkaya Başûr jî, bi parçeyekî çermîn, ji xeynî nuxumandina paşıya xwe, tazî digeriyan(41). Pişti ku me ev mînak dan, Westermark dibêje, tevî ku hove-barân tazî ji nuxumandîn şerm dikirin, hovebarân bikinc jî şerm nedikirin ku xwe tazî nîşan bidin(42).

ÇAVKANI

15. Robert Graves, *The Greek Myths*, ji Cild.I. guhestin: Reşit Ergener, Anatanri-çalar Diyari Anadolu, (Stenbol, 1988), rpl.49-50

16. Barbara Walker, *The Woman's Encyclopedia of Myths and Secrets*, ji rpl.905 guhestin: Ergener, rpl.50

17. Ergener, rpl.49

18. James G. Frazer, *Altın Dal, Dinin ve Folklorun Kökleri*, wergera tirkî: Mehmet H. Doğan, Cild.I, (Stenbol, 1991), rpl.77-8

19. Ibid. Idem.

20. Ibid. Idem.

21. George Lechler, *The Tree of Life in*

Indo-European and Islamic Cultures, Ars Islamica, Cild.IV, MCMXXXVII, rpl.370

22. Ibid. Idem.

23. S.H. Hooke, *Ortadoğu Mitolojisi*, wergera tirkî: Alaeddin Şenel, (Engere, 1991), rpl.53

24. G. Aksoy, berhemâ nav bihûrî (bnb), rpl.156

25. Memê Alan Destani, wergera tirkî: Baran, (Stenbol, 1979), ji rpl.222 guhestin: B.Aksoy, Çagdaş Bilimlerin Işığında Nuh'un Gemisi ve Tufan, (Engere, 1987), rpl.73

26. Jean Bottero, *Hersey Babil'de Baş-la*, G.Duby (Berh.), Batı'da Aşk ve Cin-sellik, wergera tirkî: Ayşen Gür, (Stenbol, 1992), rpl.22

27. S.N. Kramer, *Tarih Sumer'de Baş-lar*, wergera tirkî: M.I. Çığ, (Engere, 1990), rpl.279

28. Joseph Campbell, *Bati Mitolojisi, Tanrıların Maskeleri*, wergera tirkî: Kudret Emiroğlu, (Engere, 1992), rpl.438

29. Ibid., rpl.17

30. John Berger, *Görme Biçimleri*, wergera tirkî: Yurdanur Salman, (Stenbol, Kewçer 1990), rpl.54

31. Faik Bulut, *Tarikat Sermayesinin Yükselişi*, (Engere, 1995)

32. Evelyn Reed, Cild.I, rpl.161

33. Ibid. Idem.

34. Will Durant, *Medeniyetin Temelleri*, wergera tirkî: Nejat Muallimoğlu, (Stenbol, 1978), rpl.160

35. Edward Westermarck, *The History of Human Marriage*, Cild.I, (London, 1925), rpl.536

36. Ibid., rpl.537

37. Ibid. Idem.

38. Ibid., rpl.538

39. Ibid., rpl.540-1

40. Ibid., rpl.542

41. Ibid., rpl.543


42. Ibid., rpl.569

Wê bidome

Werger: NUR-HAYAT

Zanîngeha Kurdistanê: **Medrese (3)**

CELALETTİN YÖYLER



Bandora medreseyê bi rewsa xwe ya erêñî (pozîtîf) li ser parastin û pêşvebirina zimanê kurdî xwedîyê pareke gelekî bi nirk û hêja ye. Lewre medrese di piranî û giraniya Kurdistanê de bi zimanê kurdî dersên xwe dane meşandin û têkiliyê xwe yên di warê çand û wêjeyê de bi gelê kurd re xurt kirine. Ango medreseyê bi hezaran wêjeyan û wêjenas ji nav perwerdehiya xwe derxistine û pêşkêşî gelê kurd kirine. Bi vê çand û wêjeyâ pir giranbuha re zimanê gelê kurd hatiye parastin û xurtkirin.

Lê, bi rastî gava ku em baş li dîroka medreseyê ya kevn û nû binihêrin, emê bikaribin bizanbin ku medreseyê bi şanazî û bi serbilindî wêjevanê wekî Ehmedê Xanî û Ehmedê Cizîrî. (Melayê Cizîrî) û baz û şer û pilingê wêjezan û helbestzanê li

ser riya têkoşîn û rizgarkirina welatê "Medya" Cegerxwînê Hesarı derxistiye ser rûyê vê qadê. Ev zanyar bi tenê ne helbestvan in, zana û pispor in, di bireke şaxen zanyariyê de wekî çawa ku mirov li dîwana Melayê Cizîrî dinêre, mirov di nav wê dîwanê de birek şaxen zanistiyê dibîne. Ji aliyekevî ve mele, ji zanista astronomiyê diaxive, li aliyekevî din, ji zanista yekîtiya heyînan (wehdetil wicûd) ê diaxive.

Wekî Melayê Cizîrî, Seydayê Cegerxwîn jî di nav helbesten xwe de geh qala welat û netewe û gelperweriyê dike, geh jî qala zanista diyalektîkê û zanistên din dike.

Seydayê Xanî jî ne ku bi tenê wêjezan e, gelnas û gelperwer û olzan e jî. Anglo ew kesêñ ku ji medreseyen Kurdistanê derke-tine û mintehî bûne, pirêñ wan xwenas û hozanên gel in û gelperwer û welatparêz in. Bi van rengdêren xwe yên birêz û rûmet, bûne piştevan û parêzvanê çand û huner û wêje û zimanê kurdî. Ev a ku em dibêjin bandora medreseyâ Kurdistanê bi rewsa xwe ya erêñî ji bo parastin û bihêzki-rina zimanê kurdî. Hem jî em dikarin bibêjin ku gelê kurd pir deyndar e ji bo medreseyen xwe. Hingê dikare wî deynê medreseyâ xwe, bide. Gere di pêşerojê de

dîsa wekî heyamên berê, li medreseyâ xwe xwedî derkeve.

Ronakbîrêñ ku ji mederesevê derketine û mintehî bûne, pirêñ wan bandora xwe ya pir hêza li ser parastina çand, huner û wêjaya kurdî hiştine. Wekî çawa ku em dibînin bi sedan ronakbîrêñ medreseyê bi pêñûşen xwe yên zêrîn û birûmet nivîşen xwe yên bi zimanê kurdî pêşkêşî gelê kurd kirine. Hinek jî wan ronakbîrêñ bi zimanê kurdî yê wêjeyî, edebî berhem dane.

Hinekên wan jî li ser şaxen cur bi cur ên zanistê, xebatêñ xwe dane meşandin. Vê xebatê bi sedan sal bandora xwe ya erêñî daye ser parastin û lipeymayîna zimanê gelê kurd. Bi wêjeyî û zanistî, ronakbîrêñ vê zanîngeha bi xebatêñ xwe yên birêz û birûmet bûne çira û ronahî ji bo nirk û şopêñ gelêri yên gelê Kurdistanê. Emê ji berhemên van ronakbîrêñ hin nimûneyan di rojêñ pêş de bînîn rojevê û binirxînîn. Ji bo ku gelê me van ronakbîrêñ û berhemên wan ji nêzîk ve binase û bizanibe ku bi rastî ew ronakbîrêñ zanîngeha Kurdistanê ne; berhem û xebatêñ xwe yên pir giranbuha ji bo gelê xwe bexişandine û bi rêt û rûmet koç kirine.

1998, wê bibe sala rojnamegeriya kurdan

Li ser salvegera
Rojnameya Kurdistan,
ku destpêka weşana wê,
di nav çapemeniya
kurdan de wekî
“Roja Ronamegeriya
Kurdan” tê pîrozkirin,
li NCM’ê di 22’ê avrêlê
de panelek çêbû.
Beşdaran pêşniyaz
kirin ku sala 1998’an
ji ber ku dibe sedsaliya
rojnamegeriya kurdan,
bila wekî sala
rojnamegeriya kurdan
bê ûlankirin.

Li ser salvegera rojnameya Kurdistan, ku destpêka weşana wê, di nav çapemeniya kurdan de wekî “Roja Ronamegeriya Kurdan” tê pîrozkirin, li NCM’ê di 22’ê avrêlê de panelek çêbû. Panel di bin Rêveberiya rojnamevan Nijad Yaruk û bi beşdaraya çar rojnamevanen kurdan de çêbû. Ji rojnameya Demokrasiye Hayrettin Çelik, ji kovara Nûbiharê Süleyman Çevik, ji kovara Armancê Yakup Karademir û Gerînendeyê Weşanê yê rojnameya me Mehmet Gemsiz beşdar bûn.

Panelist, li ser diroka rojnamegeriya kurdan û pirsgirêk û astengiyê li pêşniyaz çapemeniya kurdan sekinîn. Her wiha pêşniyaz kirin ku bila sala 1998 wekî sala rojnamegeriya kurdan bê ûlankirin.

Di tûra yekemîn de panelist li ser diroka rojnamegeriya kurdi û di tûra duymîn de jî, li ser pirsgirêk çapemeniya kurd sekinîn û ji bo çareserkirina pirsgirêkan pêşniyazên xwe pêşkêş kirin.

Rêveberê panelê rojnamevan Nijad Yaruk, beriya ku panel dest pê bike, “Ez dixwazim rexne li Latif Epözdemir û Ahmet Zeki Okçuoğlu bikim, ku ji bo beşdarbûna panelê soz dabûn, lê bêsebeb û bêagâhî beşdar nebûn. Di ser de jî, nûnerê Ronahîye Epözdemir got: ‘Agahiya min ji amadekirina panelê çenebûye...’, got. Pişti vê gotinê, panelê bi ahaftina Süleyman Çevik dest pê kir.

Süleyman Çevik got, ku di nav kurdan de edebiyata devkî, ya zargotinî ji



edebiyata nivîskî bêhtir bi pêş ve çûye, û ev jî bûye sebeba windabûna gelektiştén me. Süleyman Çevik eßkere kir ku diroka kurdan jî bi vî tengî, ji aliye neyarê kurdan û biyaniyan ve hatiye nivîsandin û ev jî bûye sebebên gelektiyan. Nûnerê Nûbiharê Çevik pişte re jî wiha dom kir:

“Nivîs, parastina ziman û edebiyatê ye.. Rojname û kovarên kurdi kêm in. Alfabetê cur bi cur li pêşîya me asten-gân mezîn derdixin. Em ji pêşveçûnê zimanê xwe bêagah dimînin. Miletik ku wekî kurdan, ev çend qîmetên xwe winda kiribe, tune ye... Dîsa jî, çapemeniyê hinek tiştén kurdan parastine. Rojnameya Kurdistan 31 hejmar derketîye, lê mecbûr maye ku şeş caran cihê xwe biguherîne...”

Pişti ahaftina Süleyman Çevik, rojnamevan Yakup Karademir axivî. Karademir jî got ku li ser rojnamegerî û diroka kurdan kêm çavkanî hene, li başûre Kurdistanê di gelek waran de xebat û lêkolin çêbûne, ji ber ku berhemîn wan bi alfabebla erebî hatine nivîsandin, kesen ku bi wê alfabebla nizanî, nikarin bi hêsanî jê istîfaide bikin. Û li gotinê xwe ev zêde kirin:

“Li bakurê Kurdistanê di vî warî de tu pêşveçûn çenebûne, ev cara yekemîn e ku li ser rojnamegeriya kurdi, bi zimanê kurdi panelek çêdibe. Lê, di sed-sala bîstan de, pêşveçûn çêbûne û tesîra xwe li çapemeniyê jî kirine, mixabin pişti şikestina tevgerên siyasi, çapemenî jî bi temamî ji holê rabûye. Dema li başûrê welat perwerdehî dest pê dike, Atatürk ji rêveberan dixwaze ku bi za-

ravayê soranî perwerdehiyê bikin, ji bo ku tesîr li kurdên Bakur neke.”

Bi dû ahaftina Yakup Karademir re, Mehmet Gemsiz axivî. Gerînendeyê Weşanê yê rojnameya me Mehmet Gemsiz jî, di ahaftina xwe de, li ser diroka rojnamegeriya kurdan sekinî û got ku hîmê rojnamegeriya kurdan li biyaniye hatiye vedan û iro jî ev rewş didome, ji ber vê jî, mirov rojnamegeriya kurdan dikare wekî “Rojnamegeriya li sirgûnê” bi nav bike.

Mehmet Gemsiz diyar kir ku bi awayekî giştî, rojname û weşanên kurdan ji aliye sazî, rîexistin û tevgerên siyasi ve hatine derxistin û iro jî ev rewş didome. Her wiha daxuyand ku temenê wan weşanen zêde ne dirêj bûye. Mehmet Gemsiz pişti ku li ser kar û xebata Bedirxaniyan ya di warê çapemeniyê de sekinî, “Malbata Bedirxaniyan hem hîmê rojnamegeriya kurdi ya bi tîpêñ erebî û hem jî ya bi tîpêñ latînî danîne” got, rexneyekê xwe yê di warê rojnamegeriya kurdi de jî wiha anî ziman:

“Rojname û weşanên kurdan, xwerû bi zimanê kurdi derneketine û di gel zimanê xwe, cih dane zimanên din jî... iro jî ev kevneşop didome û rojnameyên kurdan, wekî “Ronahî” di gel zimanê tirkî, cih didine zimanê kurdi jî...”

Pişti wî jî, ji rojnameya Demokrasiye Hayrettin Çelik dest bi ahaftinê kir. Çelik pişti ku “Ez di rojnameyeke kurdan de, xebata çapemeniyê dikim, lê ne bi zimanê xwe, bi tirkî...” got, li ser pirsgirêk çapemeniya kurdan ên bi tirkî sekinî. Hayrettin Çelik got ku di

Ji aliye
çepê ve;
Süleyman
Çevik,
Hayrettin
Çelik,
Nijad Yaruk,
Yakup
Karademir
û Mehmet
Gemsiz

rojnameya hefteyî Yeni Ülkeyê de dest bi rojnamevaniyê kirîye û ji ber ku rojnameyên hefteyî xwendevanan têr na-kin, pişti demekê dest bi haziriya derxistina rojnameya Özgür Gündemê ki-rine. Çelik, di pey de jî ev gotin:

“Çapemeniyê li Kurdistanê dereng dest pê kirîye û tevgera kemalîstan, bi her awayî dibe destpêka qirkirina kur-dan. Dibe destpêka qirkirina çand, hu-ner û ziman...”

Di tûra duymîn de, panelist li ser pirsgirêk aborî, yê belavkirinê sekînîn û xwestin ku di navbera rojname û kovarên kurdan de têkiliyên baş çêbin, danûstandinê wan xurt bibin. Ji xwendevanan jî xwestin ku ne tenê weşanen ji aliye siyasi ve nêzîkî xwe, her wiha ci weşanen kurdi hebin, lê xwedî der-kevin, bikirin, bixwînîn...

Piş re jî, li ser sala 1998’an ku wê bibe sedsaliya rojnamegeriya kurdan sekinîn, ji bo ku haziriyan baş çêbin gotin ku divê ji vê gavê ve dest bi xebatê bêkirin û sala 1998 wekî sala rojnamegeriya kurdan were ûlankirin, ew sal bi konferans û gelek çalakiyên cur bi cur bê pîrozkirin. Ev pêşniyaz ji aliye hemû panelîstan ve hat pejiran-din.

Li ser pirsa guhdarekî, panelist dît-inen xwe yên der heqê MED TV de anîn ziman û tevan jî got ku MED TV ji bo pêşvebirina ziman îmkanekî mezîn e, lê bi taybetî Süleyman Çevik û Yakup Karademir televîzyonê rexne kirin ji ber ku programen bi tirkî ji diweşîne.

R. DILOVAN



● 3.5.1973

Komünîstî kurd Avni Gökoğlu dema ku ji Filistinê vedigeriya Tirkîyeyê, ji aliye leşkeren Tirkîyeyê ve hate kuştin.

● 30.4.1975

Hêzên şoreşger ên vietnamî paytexta Vietnam Başûr Saygon bi dest xistin. Pişî berxwedaneke dirêj, li hemberî hêzên dagirker ên amerikî, hêzên Vietkong ku bi rôberiya Partiya Karker a Vietnam ser dikirin, parçeyê başûr ê welatê xwe rizgar kirin û bi temamî gîhîştin serxwebûna xwe. Di vî şerî de 13 milyon û nîv kes ji gelê Vietnamese, canê xwe dan.

● 1'ê Gulânê

Di pîrozkirina 1977'an de, li Stenbolê li Meydana Taksimê, hêzên kontrayî erîş birin ser 5 hezar kedkarên ku cejna xwe pîroz dikirin. Di vê gulebaranê de 37 kedkar hatin kuştin, bi sedan kes ji bîrîndar bûn. Faîl hê ji nehatine gjirtin.

● 2.5.1983

Li başûrê Kurdistanê Mehmet Karasungur û Ibrahim Bilgin ji aliye hêzên YNK'ê ve hatin kuştin. Ey her du kes, ji bo ku di navbera her du hêzên Başûr PDK û YNK'ê de aşîf çêbe navbertiyê dikirin.

AWIR

Neynika şaristaniya hemdem ziman e



**Di kurmancî de nêr û mêtî
û hin peyv notr in,
lê di soranî de nêr û mêtî tune,
di zazakî de jî peyv
bi temamî nêr û mêtî ne.**

ma parce bû? Heke dewletek ji njadekî tenê pêk nehatibe û hûn bixwazin wê dewletê bidine jiyandin, hewce ye hûn zimanê njadên dinê qedexe bikin, ango dewleta osmaniyan ji, ji ber zimanê gelên din qedexe nekir parce bû."

Feqî Huseyn li ser malbatê zimanan sekînî û diyar kir ku çar malbatê bingehîn ên zîmîn hene: 1) Îndo-Ewrûpî (Nêr-mêtî û tewangêne tê de hene), 2) Çin-Tibet, 3) Ural-Altay (bi paşgiran peyv têne çekirin) 4) Bantu (tewangbar e).

Li ser malbatâ zimanê Îndo-Ewrûpî ji Sağrıç ev agahî dan. Malbatâ Îndo-Ewrûpî 6 şaxen wê hene:

1. Sanskriftî. (Bi vî zimanî li Hindistan, li hin cihê Pakistanê tê axaftin.)
2. Aryanî an jî arî (kurd, fars, belûcî ...)
3. Latînî (İtalî, bîzansî ...)
4. Germanî (Anglo-sakson...)
5. Silavî (ûris, bulgar, hirvat...)
6. Grekî (ev jî ji malbatâ Îndo-Ewrûpî ye lewre pir cihêreng e ku iro yewnan pê xeber didin. Ev ziman zimanekî navneteweyî ye, heke peyvîn yewnanî ji nav zimanê dinê derkeve wê zimanê pir gelan seqet bimîne.)

Di gelek şaxen zanyariyê; di felsefe, sosyolojî û matematîkê de zimanê yewnanî tê bîkaranîn. Di kurdî de jî peyvîn ku cihê peyvîn girekî brgirin hene, lê pir hindik têne zanîn.

Hüseyin Sağrıç der barê awayê çêbûna peyvan de jî peyivî û li ser lêkolînênu ku der barê zaravayê kurdî kirine ev agahî dan. Zaravayê kurdî de yên wekî kurmanciya jorîn, kurmanciya xwarê (soranî), kirdî (zazakî), hene. Her wiha di kurmancî de nêr û mêtî de temamî peyvan de tune, hin peyv notr in, lê di soranî de nêr û mêtî tune, di zazakî de jî peyv bi temamî nêr û mêtî ne.


Feqî Huseyn bi temamî, bi zaravayê kurdî kurmancî axivî û got: "Mirov ku bibêje ez kurdî xeber didim ew xelet e, ji ber ku kurmancî jî zaravayekî kurdî ye."

Di dawiyê de jî diyar kir ku, wê her tim sempozyûmîn li ser zimanê kurdî ji aliye Enstîtuya kurdî ve bîn çekirin.

METİN AKSOY

ÇAVDÊRÎ

MİRHEM YİĞİT



Rêexistina polisan
dikeve 151 saliya xwe

Berî bi çendekê dewleta tîrk salvegera damezrandina rêexistina polîsan Tirkîyeyê pîroz kir. Teşkilata polisan dikeve 151 saliya xwe û ev 151 sal in ku polîs û emniyeta tîrk xwedî rêexistin e. Dewleta tîrk ne bi forma iro be jî, ji dewleten kevn e û jî 1000 salî û bi vir de û hê berêtir ji dewleteke militarist û polîsi ye.

Giş dewleten ku li ser bingeha talankirin û malxerabkirina gelên din ava dîbin, pişta xwe didin militarizmû û istîxbarateke xurt. Artêşa tîrk jî ev li dora 700 salî ye ku heye. Tarîxa artêş, militarizm û sîstema istîxbarata tîrk, tarîxa dagirkirin, hilweşandin û agirpêvekirina welatên cur bi cur, welatên Rojhilata Navîn, Balkan û "ji Çinê heta bi Derya Adriyatîkê" ye. Giş gelên li nav Derya Adriyatîkê û Çinê, ji ereban bigire heta bi farisan, ji ermen û asûriyan bigire heta bi kurdan, ji Yemenê heta bi Bakurê Afrîkayê, yewnan, bulgar û giş gelên nîvgirava Balkanê tev zilma leşker û polîsan tîrk û pêşiyên wan dinasîn.

Gava behsa leşker û polîsan tîrk dibe, tevzinok ji laşê wan hildikîşin û li ser vê zordaryê bi dehan serpêhatî û çîrok hene. Ez di dawîya payîza 1969'an de, du mehan li paytexta Bulgaristanê, li Sofyayê mam. Di vê navê de min hin tîrkîn bulgar û hin kesen bulgarî nas kirin. Her wiha min bi zimanê tîrk jî çend kitêb peyde kirin. Di nav van kitêban de kitêbeke nîvîskar û helbestvanê bulgar Xirîstof Botef jî hebû. Kitêb ji meqaleyê kurt û rojnamevîyê hatîbû pê. Giş meqale li ser îşkenciyê polîs û hovîtiya ordiya tîrk bûn. Di vê dema dumehî de, min dît ku hema bibêje, giş mirovîn bulgarî navê bajarê Amedê nas dikin. Ji ber ku giş girî û sîrgûniyên wan ên siyâşî ji aliye dewleta osmanî ve li Amedê dihatin komkirin.

Li ser qirkirin û şapelêrakirinê dewleta osmanî û tîrk gelek kitêb hatine nîvîsandin û film hatine çekirin. Kitêbek ji van jî kitêba Jan Arnald e, ku li ser qetîlama Girava Çixosê ye. Ev qetîlam û wehşet di sala 1822'an de li Yewnanîstanê qewimiye.

Gelekî balkêş e ku ev çend sal in dewlet salvegera damezrandina teşkilata polisan bi helehelela û fexfexeke gelekî mezin pîroz dike. Reklam û mesrefen mezin têne kirin, şevîn şahîyê têne li darxistin û radyo, televîzyon û çapemîniya tîrk her tişî dike da ku polîsan wekî melayîketan bide nasandin. Pir hewl dide ku polîsan di çavên xelkê de şîrîn û bêguneh bike û xwînrêjî û quesabiya vê teşkilatê veşêre.

Sık tê de tune ku polîsan tîrk ji xedartîrin û barbartîrin polîsan dînyayê ne. Xedarı û zilma polîsan, bi taybetî gelê kurd û mirovîn bajarên mezin ên mîna Stenbolê û Engere û deverên din, dinasin û bi çavên serê xwe dibînîn. Xelk dizane bê polîs çendî dilkevir û bêmirwet in, çendî dijminê fikirkirina azad û serbixwe ne û heta niha çend caran li Kurdistanê û li bajarên mîna Stenbolê kerxa laşan rakitiye. Serokpolîs û kevnewaliyê Kurdistanê û parlementerên iro Ünal Erkan, Nejdet Menzir, Mehmet Ağar û Hayri Kozakçıoğlu çend qatil in ku Gestapo jî nikare avê li desten wan bike û ew jî dê heta heta mîna Hitler, Göring û giş şefen SS'yan bi lanet bîne bibîranîn.

Navdariya polîsan tîrk biracêwiyê Erkan û Menzir ne kêm caran bala rejîsor û hunermendîn ewrûpî jî kişandîye û di filmên mîna Midnight Ekspress (Trena Nîvîşevê) de bûye dabaş. Amnesty, Rêexistina Léborîn û Efûkirên Cihanî jî heta niha di raporê xwe de çend caran cihekî xurt daye eseq û binçokirinê polîsan tîrk. Dewlet pereyekî mezin dide polîsan û ji bo ku hejmara polîsan zêde bike pir dixebe. Nûnerên dewletê, rojname û çapemîniya tîrk ci dikan, bila bikin û ci dibêjin bi kîfa xwe ne; ew nikare imaja li ser polîsan tîrk; ci li derive û çi li hundir çêbûye, rake.

Dîvî ziman bi her awayî tekûz û qewî be ku berhemên navneteweyî jî bikaribin pê bîne afirandin. Li ser tekûzbûn û saxlembûna ziman, nîvîskarek wiha dibêje: "Ez pirtûka xwe ji bo ku pir hindik kes bixwînîn û ji bo demeke kurt dînîvisinim. Lewre hûn ji min pirtûkeke ji bo ku her kes bixwîne û navneteweyî be bixwazin, pêwist e ziman tekûz be û saxlem be."

Li gorî vê hevokê em iro li rewşa zimanê kurdî dînîhîrin bi rastî jî li gorî malbatâ ku jê hatîye zimanekî bi bingeh û berfîreh e, lê hîna jî yekîtiyeke ziman çênebûye û her kes li gorî xwe zimanê kurdî bi cihekî ve girê dide.

Li ser zîmîn, Enstîtuya Kurdi li NCİM'ê roja 24'ê avrîlê sempozyûmek çêkir. Axaftvanê sempozyûmînê zimanzan Feqî Huseyn Sağrıç bû. Sağrıç bal kişande ser vê xala gitîng û diyar kir ku, heke zimanê gelekî tekûz nebe, saxlem nebe nikare di qada navneteweyî de cih bigire. Ziman medeniyetên mezin diafirine, gelên dagirker ji ber wê yekî ye ku zimanê neteweyîn bindest qedexe dikin, kijan gelê bindest dibe bîla bibe, heke zimanê xwe ji bindestiyê xelas kiribe azadiya wî gelî bi xwê çêdibe.

Sağrıç pişî van gotinan, axaftineke ku Atatürk kiriye, anî ziman. Li gorî zimanzanê kurdî, dema ku komara Tirkîyeyê nû ava bûye Atatürk ji bo parçebûna osmaniyan wiha axivîye: "Hûn dizanîn dewleta osmaniyan ci-

Siyasetvan Mahir Kaynak li ser rewşa gelê kurd û tirk axivî:

Yekîtiya kurdan ji bo selametiya tîrkan jî baş e

Mahir Kaynak xwediye şexsiyeteke rengîn e û bi teoriyên xwe yên der barê siyasetê de navdar e. Gelek kes bi gumanî nêzîkahî tê û bi ramanên wî didin. Tezên wî yên li ser helkirina meseleya kurdan jî zehf balkêş û cihêreg in. RAHMÎ BATUR li ser van mijaran pê re peyivî.

Bi taybetî kurd, lê tirk jî, ji wan kesen ku di nav îstixbaratê de cih digirin direvin, xwe ji wan diparêzin... Yen ku siyaseta dewletê ya fermî herî bi hişkahî didine meşandin, ew têne zanîn. Lî çawa ku tê xuyan hûn aştiyê dixwazin, hûn çawa gihiştine vê merhaleye, an jî hûn ji berê ve jî wiha bûn?

● Ez ji berê ve wiha bûm.. Ji parcebûna osmanîyan komareke nû derket û ev komar, ya wan hemû kesan e ku lê dijîn, kes nikare bibêje ev komar a min bi tenê ye. Ez çiqas dikarim bibêjim ev komar a min e, divê her kurdek jî bikaribe vî tiştî bibêje û mafen xwe baparêze.

Divê em guh bidine dengen wan, daxwazên wan. Û ez dibînim ku daxwazên wan ne di eleyhê me de ne; fikir û daxwazeke ku Tirkîyeyê diparêze, mezinbûn û xurtbûna wê bike armançez çawa, dikarim li dij derkevîm! Ku min bidîta kurd li pey tunebûna me ne, ezê jî li dijî wan derketama, lê ez tiştî wisa nabînim... Ez daxwazên wan ji bo selametiya me jî baş dibînim, çima li dijî vê dozê derkevîm?..

Yanê, dema ku ez aşîf û demokrasiyê dixwazim, parastina kurd, tirk, an jî nizanîm ya kî nakim, ez parastina komarê dikim. Ji ber ku ez ji nav dewlet têm, wê wextê ez wezîfeya xwe dikim...

Madem wiha ye; ji bo ci dewlet wezîfeya xwe nake?

● Ramana wan a ji bo ewlekarî û yekîtiya Tirkîyeyê, ji raman û dîtinê min cudatîr in, ew ji aliye domkirina ideolojiya fermî ne û dibêjin wê ev, dewletê ji talûkeyan biparêze. Ez ne wisa difikirim. Belkî ev ideolojiya fermî di demekê de, ji bo çareserkirina pirsgirêkan bi kîr hatibe, lê ez dibêjim tiştîn ku berê rast bûn, dibe ku vê gavê ne rast bin. Nêrîna me ya fermî iro, ne ji bo selametiya me ye, ez selametiya Tirkîyeyê iro di xeta ku ez dişopînim de, dibînim...

Ez wan kesen ku dewletê idare dikan

niyetxerab nabînim, ji parcebûnê zêde ditîrsin û ez ne bawer im ku ev hesasiyeta wan ji bo me, ji bo Tirkîyeyê baş be.

Ev ne wekî hesasiyatekê tê xuyan, ji ber ku piraniya wan li gorî tê xuyan, wekî we difikirin..

● Ez vê jî bibêjim; ev hesasiyeta wan ji aliye hinek hêzên biyan ve jî tê mezinbirin, dibêjin ku "hûn mafen kurdan bidine wan, wê ji we veqetin" lê ez dibêjim parcebûna me, ji wan re ne xem e, xema wan menfaeta wan e... Ewrûpa dixwaze ku Tirkîyeyê di şeklê xwe yê iro de bîmîne, xwe dirêjî derdora xwe neke, eleqeya xwe bi kesî re neyine, lê ez dibêjim tesîreke me ya dîrokî li ser Rojhilata Navîn heye. Divê bi kurd û tirkê vî welatî ve, em li herêmî roleke baş bilizin. Pirsgirêken Rojhilata Navîn ne bêyî tîrkan, ne jî bêyî kurdan çareser dibin. Yekîti, me biçûk nake, wê mezin bike, lê ku em ji hev veqetin tesîra me wê dakeve sifirê...

Beri demekê dewletê dest bi operasyoneke dorfîreh kir û ev operasyon di demeke ku Serokwezîr Mesut Yilmaz behsa çareserkirina pirsgirêka kurd û rewestandina vî şerî dikir de, dest pê kir, çima?

● Tiştîkî balkêş e, ku kengê PKK agirbest ilan bike, şerekî mezin diqewime, em zaiyateke mezin didin, û gelê tirk tê infîalê... Tê zanîn; berê jî li Çewlikê (Bîngolê) kemîneke ku zaiyat gelek bûn, gelek şehîd çebûn, qewimbû. Û ev bûyer bûbû dawîya agirbeste...

Ez vê yekî rast nabînim. Dewlet, bi awayekî fermî agirbeste qebûl neke jî, divê operasyonê xwe rawestîne, alîkariyê bide pêla bayê aştiyê.. Em dibînin, hinek hêzên ku aştiyê naxwazin, bi van livbaziyê xwe, peşk li nêzîkahîyê aştiwazî didin...

Operasyon her tim çêdibûn, lê hejmar raserî sedan nedihat telafuzkirin... Baş e, çima di demeke wiha de, hejmarê zêde didin?

● Ez jî wê işaret dikim; di agirbesta berê de jî, ev tişt qewimbû, disa wekî berê çebû... Hinek hêz ji bo ku aştiyê xera bikin, ci ji destê wan tê, dikin. Ez nikarim bibêjim dewlet bi qest û zanîn vê dike, ji ber ku agahiya me bi rastiya vî karî nîn e. Tenê dikarim bibêjim, ev tişt ne rast e, xerab e...

Hûn dewletê baş dinasin; li gorî we, ji bo vî welatî iro talûkeya herî mezin kî ye, ci ye?

● Li gorî min, talûkeya herî mezin ev şerî navbera tirk û kurdan e. Hinek talûkeyen ji derve jî hene, ji ber ku em li ser erdekî stratejîk in, gelek hêz dixwazin me li gorî daxwazên xwe bidine meşandin, ev tiştîkî normal e, lê talûkeya mezin ev şer e... Divê, muheeq dawîya vî şerî were. Ez ji berê ve dibêjim; di navbera tirk û kurdan de, tiştîkî ku li serê li hev nekin nîn e. Ez ne bawer im ku pirsgirêken di navbera me de gelek mezin bin. Û bawer nakim ku dewleteke ji Tirkîyeyê cuda, li gorî menfaeta kurdan be.. Hedef û armâanca her du gelan yek in. Ne tirk û ne jî kurd, çareserkirineku zirar bide wan, wê qebûl nekin... Divê kurd bikaribin bi hêsanî nasnameya xwe ya neteweyî û kultura xwe biparêzin, li pêsiya wan divê tu asteng neyê derxistin. Divê ideolojiya fermî bi awayekî wisa bê guherandin ku mafen her du gelan jî biparêze û zirarê nede kesî...

Cawa ku tê zanîn; Turgut Özal dixwest ku bi başûr û bakurê Kurdistanê re federasyonekê çêke, lê negîhişt vê miraza xwe! Li gorî we, di şertîn iro de tiştîkî wisa mimkun e?

● Agahiya min bi wê projeyê heye, pê dizanim, lê di şertîn iro de, di demeke kurt de ev pêk nayê. Ji berê ve li hemberî vê, tezeke min a alternatif heye, ez dixwazim tekrar bikim:

Divê li bakurê Iraqê dewleteke kurd bê avakirin. Di şerî de, divê tiştîkî vê dewletê bi Tirkîyeyê re ne bi şeklekî federasyonî be, lê divê Tirkîyeyê ji her aliye ve vê dewletê hîmaye bike, biparêze.. Di şertîn iro de, ev daxwaz, daxwaza herî maqûl û realist e... Bi besdariya hinek bajarê kurdan ên di nav sînorêne Tirkîyeyê de, avakirina federasyonekê gelek zehmet e. Lê ku li wir dewleteke kurdan ava bibe û Tirkîyeyê tiştîkî vê bi wê dewletê re xurt bike, wê di nav siyaseta dînyayê de, mirov bikaribe biparêze, ev ji bo çareserkirine şewyeke baş e...

Baş e, heta Tirkîyeyê pirsgirêka di nav xwe de çareser neke, bi kurdan bakur re li hev neyê, dikare vê yekî bibe seri?

● Na, nikare... Ji bo ku bikaribe li bakurê Iraqê serfiraz be, divê berî her tiştî Tirkîyeyê bi kurdan di nav xwe de li hev were. Ku hebûna kurdan qebûl neke, wê bi ci awayî bikaribe, bi wan re têkiliyê baş çêke? Jixwe, nêzîkahîya Tirkîyeyê ya iro, çareserkirineke bi vî rengî li derveyî imkanan dihêle.

Iro tu ji kî bipirsî, dibêjin ev şer tu pirsgirêkê çareser nake, divê em bi şewyeke din nêzîk bibin, lê şer jî her dom dike... Yen ku vî şerî didine meşandin kî ne?

● Mirov nikare bersiva pirsa "Kî ne?" bide, lê li gorî nêrîna min ku di navbera tirk û kurdan de aşîf çêbe, wê ev dewlet gelekî bi hêz û xurt bibe, ev tişt jî, li hesabê hinek hêzan nayê. Û ji ber vê jî naxwazin ku ihtilafa di navbera me de xelas bibe.... Lewre, aşîf wê vê komarê di herêma Rojhilata Navîn de



bike dewleteke bîhêz û xwedî bandor. Û aşti di navbera her du gelan de wê nebe sebebê ji hev dûrbûnê, vegetandînê, wê wan bêhtir nêzîkî hev bike. Lê mixabin ku îdeolojiya dewletê ya fermî, rê nadî fêmkirina vê ramanê.

Dewlemendê Tirkîyeyê di bin du serian de, li dijî hev siyasetê didine meşandin; li aliye Sabancı, li aliye din jî Koç.. Û ev dubendî tesîra xwe li vî şerî jî dike. Ji xeynî van her du aliyan, hinek hêzén din jî hene gelo?

● Tabî, di qedera vî şerî de hêzên siyaset û sermayedar roleke mezin dili-zin, lê ev rola wan, tesîra wan jî, ne bê-sînor e, ji ber ku di meseleyên wiha de hêzên dînyayê yên mezin jî, muheqeq mudaxale dikin, alî digirin, tesîrê lê dikin... Yanê herikîna vê meseleyê em ni-karin tenê bi hêzên vî welatî ve girê bî-din, tesîra derive jî heye... Îro du hêz he-ne ku dixwazin me bi aliye xwe ve bikişinîn: Amerîka û Ewrûpa.. Amerîka di Rojhilata Navîn de dixwaze bi Tirkîyeyê re itifaqê çêke û Tirkîye li herêmê, di bin kontrola wê de bibe dewleteke xurt û bîhêz, ji bo ku menfaetên xwe yên vê herêmê biparêze. Li aliye din Ewrûpa jî, ji bicibûna Amerîkayê ya li Rojhilata Navîn aciz e, vê naxwaze. Ew dualibûna ku hûn dibêjin jî, ji vir derdikeve.

Tirkîye ji van her du aliyan mecbûr e ji xwe re aliye kî biecibîne. An bi awayê daxwaza ku Ecevit serî dikişîne; wê bibêjin bila statuko dewam bike, berdin, bila bi Saddam re rûnin, yekîtiya erd xera nebe; yanê bila kurd werine perçiqandin... Ev jî şeweyleke çareser-kinîne ye, lê ez bawer nakim ku ev çare

li gorî daxwaz û menfaetên Tirkîyeyê be, ez dibêjim hedefeke Tirkîyeyê ji bo Iraqê û yekîtiya erdê Iraqê gerek e tune be, gerek e daxwaz û armansa me parastina mafen kurdan be, ku di nav vî welatî de hemwelatiyên me yên kurd gelek in. Divê em dostaniya kurdan deynin pêsiya xwe, ne dostaniya Iraqê. Ev ji bo selametiya me jî baş e...

Mirov dikare wê gavê bibêje dewlet di nava xwe de xwedi yekîtiyekê ye?

● Na, pirsgirêk jî, ji vir derdikevin... Ew hêzên ku dewletê temsîl dikin yek bûna, di fikrekê de bûna, çareserkirina pirsgirêk jî, wê êdî hêsan bûya. Ji du siyasetan meyê yek heta dawiyê bipa-

nî! Ji bo me hiqûq girîng e, an Tirkîye! Em ji bo selametiya welat hiqûqê binpê dikin!..”

Mantiqê wan ev e.. Lê em jî vê dibê-jin:

“Hûn bi vê rê, ji bo selametiya welat xizmetê nakin, bi vî awayî hûn Tirkîyeyê bêhêz û taqet dixin.. Ku hûn riayetî hiqûqê bikin, wê Tirkîye bêhtir xurt û bîhêz bibe”.

Lê li pişt vê siyasetê jî, dîsa hinek hêzên biyan û ne diyar hene... Yanê hinek hêz, bi navê aqilmendiyê dixwazin ku em hiqûqê binpê bikin û bêhêz bikevin.. Dîsa hinek rîveberen me jî, bi wan bawer dikin, bi vî awayî têne xapandin.

Dema statuko bidome, wê parçebûyîna kurdan jî her wisa dom bike û here. Kurd bi alîkariya Tirkîyeyê wê bikaribin yekîtiya xwe çêkin. Dema tirk û kurd li hev werin, wê yekîtiya kurdan çêbe. Wê yekîtiya kurdan li dora Komara Tirkîyeyê çêbe...

rasta û rast-nerast em dê bigihîstana encamekê. Lê di nav rîveberen Tirkîyeyê de cudabûnên ramanî yên cidî he-ne..

Dewletê navê komarê li xwe kiriye, lê çawa ku tê xuyan hê jî, ji mantiqê eşîri derbas nebûye, li bûyeran wekî eşîran nêzîkahî dike..

● Rast e... Gelek caran ne wekî dewlet, wekî eşîran li bûyeran, li hiqûqê nêzîkahiyê dike, em hemû dibînin.. Dema ew hiqûqê binpê dikin, dibêjin: “Tu dê ji bo hiqûqê Tirkîyeyê bipelişî-

We got di nav dewletê de du fikir, du hêz ser dikin. Di meseleya besdarbûna Yekîtiya Gumrikê de jî, ev ser dom dike, li gorî we wê kîjan alî bi ser bikeve, an jî dibe ku her du alî jî serfiraz nebin?

● Çawa tê xuyan Tirkîye mecbûrî itîfaqekê ye, hemû dewletên dînyayê mecbûr in... Amerîka û Rûsyâ jî di nav hinek itîfaqan de ne, ev nayê wê maneyê ku istiklala xwe bi destê hinekan ve berdidin.

Şirîkatiyek e, heta ku menfaetê we di istiqametekî de bin wê şirîkatî dom

bike.

Dibe ku Tirkîye tevî Yekîtiya Ewrûpiyan bibe, lê ez dibêjim ku tevî bibe, wê bandora me ya li ser Rojhilata Navîn were şikandin. Her ku here, wê di bin kontrola ewrûpiyan de bêhêz bibe, di dawiyê de jî Tirkîye wê bipelişê, yekîti xera bibe...

Li hemberî vê, Tirkîye dikare di eksena Amerîka û Rûsyayê de li herêmê bîhêz û quđret be, ev ji bo selametiya me çêtir e.. Ez di vê eksenê de Tirkîyeyeke wiha xeyal dikim:

Tirkîye bi kurdan re li hev hatiye, armanca xwe û wan kiriye yek, dubendiya di navbera xwe de berteref kiriye û yekîtiya kurdan jî çêbûye.. Û her ku diçê li herêmê bûye xwediyê bandoreke serbixwe.

Armanc û hedef ji bo min ev e.. Di-be ku yêfikra min diparêzin, serfiraz nebin, li ser Tirkîyeyê tesîra ewrûpiyan jî ne hindik e.. Ji vê gavê ve, nedîyar e ku wê kî serfiraz bibe...

Ez vê jî bibêjim ku, kurd jî dixwazin Tirkîye bi Amerîka re itîfaq çêke...

Ji bo çi, qey ev itîfaq ji bo menfeeta wan çêtir e?

● Belê, ev li gorî menfaeta wan e.. Lewre, ku itîfaqa Tirkîyeyê û ewrûpiyan dom bike, parçebûna kurdan jî, dom bike, ji ber ku statukoya Rojhilata Navîn wê bidome. Dema statuko bidome, wê parçebûyîna kurdan jî her wisa dom bike û here... Yanê bi gotineke din, kurd bi alîkariya Tirkîyeyê wê bi-karibin yekîtiya xwe çêkin. Dema tirk û kurd li hev werin, wê yekîtiya kurdan çêbe. Wê yekîtiya kurdan li dora Komara Tirkîyeyê çêbe...

MAHÎR KAYNAK

Di sala 1934'an de li bajarê Dîlûkê (Entab) hatiye dînyayê, dibistana seretayî û ya navîn li Dîlûkê diqedîne û dest bi Kuleli Askeri Lisesi (Liseya Kuleli ya Leskerî) û pişt re jî dest bi Harp Okulu (Dibistana Cengê) dike. Di sala 1953'yan de mezûn dibe. Di sala 1957'an de ji leşkeriyê vediqete û di sala 1961'ê de fakulteya iktisadî diqedîne û di wê salê de jî di fakulteya iktisadî de dest bi asîstaniyê dike. Piştî ku di sala 1971'an de dibe doçent, dest bi karê istixbaratiyê dike, dibe endamê MİT'ê. Di sala 1980'yan de bi teqawitbûnê ji MİT'ê vediqete. Di sala 1982'yan de jî, careke din vedigere zanîngehê û di sala 1983'yan de bi nîşana profesoriyê teqawit dibe. Zewicandi û sê zarokê wî hene.



Dijîtiyên di navbera Tirkîye û Sûriyeyê de



Li Rojhilata Navîn her kes hewcedarî avê ye.
Tirkîye û Sûriye li ser ava kurdan li hev nakin.
Li ser Çemê Feratê gelek bendav hatine çêkirin.

Imparatoriya Osmanî 400 salı li ser gelê ereb dagirkeriya xwe da meşandin. Rêveberiya İttihat Terakî bi  estê Cemal Pa a Elsefahango Cemal Pa ayê xwînxwar di 6'ê gulana 1916'an de, nêzîki bîst rewşenbîrêne ereb ên neteweperest li bajarê Şamî bidarvekirin. Dîsa di sala 1916'an de, bi serokatiya Husên Şerif Meke û bi alîkariya  ngilizan, gelêne ereb serhilda-na xwe ya mezîn li dijî osmaniyan pêk anîn û ji wan cuda bûn. Heta gelek ni-vîskarêne kemalist dibêjin, "Ereban wê demê li me xiyanetî kir".

Bi kurtayî mirov dikare bibêje ku, paytexta Sûrî Şam ji berê ve cihê neteweperestêne ereban e; ji berê ve di navbera neteweparêzêne ereban û osmaniyan de û pişt re jî di navbera kemalist û ereban de dijberî û nexweşî hene.

Di navbera Şerî Cîhanê yê Yekemîn û Duyemîn de, welatêne ereban û Kurdistan, di navbera  ngiliz, frensiz û rejîma M. Kemal de hatin parêkîrin û parvekirin. Di vê demê de, li hêlekê serhildanêne ereban li Filistinê, Sûrî û Iraqê û cihêndin, li dijî kedxwarêne frensiz û  ngiliz des pê kiribûn, li hêla din jî M. Kemal têkiliyêne xwe yên aborî û siyasi bi kedxwarêne  ngiliz û fransiz re xurt dikir.

Di navbera her du şeran de, Peymana Enqereyê, Peymana Londonê û Loranê çêbûn. Li gorî van peymanan, Başûrê Biçûk ê Kurdistanê teví Sûriyeyê ji Fransayê re ma, başûrê Kurdistanê teví Iraqê ji kedxwarêne  ngiliz re man, parçeyê Kurdistanê yê mezîn jî di bin destê kemalistan de ma û bû parçeyekî

Di sala 1973'an de, hem şerî ereban û Israîlê û hem jî astengiya petrolê derket. Tirkan di vê demê de valahiyek dît û Bendava (beraja) Kebanê li ser Çemê Feratê da çêkirin. Sûriyê jî di van salan de Bendava Tabqa bi alîkariya Sovyetê li hêla xwe da çêkirin.

ji erdê "Mîsaqi millî".

Di sala 1939'an de bi xapandin û hîlebaziyê, parçeyekî axa Sûrî ku bi navê Antakya û İskenderûnê tê naskirin, ji Tirkîyeyê re ma û gotin ew "xelata Ataturk e". Bi vî awayî jî kemalistan destê xwe dan împêryalîzma cîhanê û dijminatiya xwe ya dijwar û kevnar ji gelê kurd û ereb, ermen û hwd. re careke din dane nîşandan.

Piştî Şerî Cîhanê yê Duyemîn, Sûriyeyê serxwebûna xwe ya siyasi ji Fîrensan stand û pê re, dijîtî û nexweşîyên di navbera dewleta Sûrî û Tirkîyeyê de roj bi roj xwe dan xuyakîrin. Di vê demê de jî, heta berî vê demê jî, gelek rewşenbîrêne kurd ên wekî Nûrî Dêrsimî û Osman Sebrî xwe li Sûrî bi cih dikirin.

Li Sûrî serdema Cemal Abdul-Nasir

Di sala 1950'an û bi sün de, rejîma kemalist bû endameke NATO'yê. Li Sûrî jî tevgîra Baas ya burjuwaziya biçük a radikal li dijî siyonîzmê û Amerîkayê bi alîkariya Misirê û Sovyetê bi pêş diket. Bi taybeti jî piştî ku, Cemal Abdul-Nasir bandora xwe li ser gelê ereb û rejîmêne wan çêkir, nexweşî û dijberî di navbera Tirkîye û Sûriyeyê

de hê germtir bûn.

Nasir wê demê ji rejîma Tirkîyeyê zêde ne razî bû. Di vê qonaxê de rejîma kemalist têkiliyêne xwe yên bingehîn, bi awayê siyasi û leşkerî û istixbaratî bi Israîl re, hin caran bi dizî û carinan jî bi ekere domand û xurt kir. Rejîma Baas ku sala 1963'an heta ser karê dewleta Sûrî, careke din kêşeya Antakya û İskenderûnê anî bîra ereban, ji bo vê armancê di pirtûkîn dibistanan de Antakya û Isenderûnê her dem di nav erdê Sûriyeyê de hate nîşandan.

Piştî ku Hafiz Esad rêveberiya Sûrî xiste destê xwe, dijberiyêne Sûrî û Tirkîyeyê ketin domaneke nû, vê carê pîrgirêka ava Feratê derket pêş. Di sala 1973'an de, hem şerî ereban û Israîlê derket, hem jî astengiya petrolê di navbera împêryalîzma cîhanê û Rojhilata Navîn de derket. Rejîma tirk di vê demê de valahiyek dît û Bendava (beraja) Kebanê li ser Çemê Feratê da çêkirin. Dewleta Sûriyeyê jî di van salan de Bendava Tabqa bi alîkariya Sovyetê li hêla xwe da çêkirin.

Têkiliyêne rejîma tirk her çiqas bi dewletêne ereb ên monarşîk û paşverû re xurt bûn jî vê demê, lê belê di şexsê Sûriyeyê de mirov dikare bibêje vê demê di navbera radikalîzma ereban û rejîma

Tirkîyeyê de şerekî bêdeng (şerî sar) hebû.

Her çiqas Sûrî, diplomasiya xwe ya nehêni li dijî rejîma tirk dide şixulandin, da ku nehêle tirk teknikê û pereyan (sermaye) peyda bike ji bo bendavêne li ser Çemê Feratê, lê belê Sûrî di vî warî de bi ser neket. Piştî Bendava Kebanê, Bendava Kartalkaya li Semsûrê (Adiyaman) hate çêkirin. Sûrî li dijî Tirkîyeyê di warê ramyari û diplomasiyê de şerî xwe yê bêdeng heta sala 1980'an berdewam kir.

Dijayetiya cûntaya tirk a li dijî gelên herêmê

Di 12'yê Rezberê (ilonê) de Amerîkayê rejîma Kenan Evren anî ser textê sistêma kemalîzmê. Di wê demê de rûreşya kemalistan û dijminatiya wan a dijwar ji gelê Rojhilata Navîn re, şîlf û tazî derket ber çavan. Armanca Kenan Evren ew bû ku, ji Amerîkayê re bibe polîs, wekî bav û kalên xwe pêşî xwest tevgîra şoreşgerî li Kurdistanê û Tirkîyeyê tune bike û bifelişîne.

Piştî sala 1980'yî cûntaya faşist bi fermanê CIA'yê û bi alîkariya paşverûyêne ereb, deriyê xwe ji rêexistina Ixwan ûl-muslimîn (Birayê Misilman) re vekir, da ku ji erdê Tirkîyeyê xwe amade bike û ji wê derî erîşan bide Sûriyeyê. Di van salan de (1980-1983) dewleta Sûrî kete rewşike dijwar, ji ber erîşen vê rêexistinê ji erdê Tirkîye, Urdîn û Iraqê.

Wê bidome
HUSÊN ŞAWÎS



Li Navenda Çanda Mezopotamyayê, li Şaxa Beyoğluyê vê heftiyê ev çalakî hene:

● **28.4.1996 Yeksem**

Teatra Jiyana Nû (Rojbaş), Saet: 14.00
Axaftin û resîtalek ji Kanûnê, Halil Karaduman, Saet: 18.00

● **29.4.1996 Duşem**

Konsera Stranên Gelêrî yên Nûjen, ji NQM'ya Stenbolê, Saet: 14.00
Ji beşa Hunerên Dîtbâri ya NQM'ê Film: "JFK", Saet: 18.00

● **30.4.1996 Sêsem**

Ji Teatra Jiyana Nû "Rojbaş", Saet: 14.00
Konsera Koma Gulên Xerzan, Saet: 18.00

Çalakîyên li BEKSAV ê jî ev in:

● **28.4.1996 Yeksem**

Xêzefîlm ji bo zarokan, Saet: 12.00
Konsera Koma Agirê Jîyan, Saet: 18.00

Li NQM'ya Izmirê çalakîyên vê heftiyê:

● **29.4.1996 Duşem**

Golübê li ser "Şahidê Bêdeng", Amadekar: Ramazan Öztürk

RÜDAN

'Ekspresa Aştiyê' ji Stenbolê bi rê ket

Komeleya Mafêni Mirovan Şaxa Stenbolê ji bo ku şer raweste qesfileyeke aştixwazan xiste riya Amedê. Tevî rayedarê Komeleya Mafêni Mirovan gelek rewşen-bîr û hunermendê aştixwaz bûn rîwin-gên 'Ekspresa Aştiyê'. Her wiha Berdevka Grûba Keskan a Parlamento Ewrû-payê Claudia Roth jî heta Îzmîte pê re çû û ji wir ew bi rê kîrin.

Ekspresa Aştiyê ji İstasyona Haydarpaşayê rabû. Di wê demê de nezîkî 500 kesî ji bo rîkirinê amade bûn. Roja 21'ê avrêl saet li 6'ê êvarê rîwî û oxirkarêwan li Haydarpaşayê civiyan. Li wê derê Koma Govendê ya KAYY-DER'ê bi daholê ci-vat xiste govendê û moraleke baş da beş-daran.


Kesê wekî hunermend Ferhat Tunç, Edip Akbayram, İlhan İrem, Gerînendeyê Sînemayê Zeki Demirkubuz, Ahmet Türk, Sırri Sakık, Cîgirê Serokê HADEP'ê Osman Özçelik û Rayedara ÖDP'ê ya Stenbolê Hürriyet Şener jî ketin goven-dê. Piştî govendê Serokê Komeleya Mafêni Mirovan Şaxa Stenbolê Ercan Kanar axaf-tinek kir. Kanar di axaftina xwe de wiha got: "Ev têkoşîna me ya ji bo aştiyê ber-dewam e. Heta ku bayê aştiyê şerxwaziyê ji holê rake, wê bidome. Èdî şerxwaz divê nîkaribin li ser xwîna zarokêne me, qezenc

bi dest bixin. Aşti bi tenê ji bo vê yekê jî gelek pewist e." Di pey de Kanar daxu-yand ku di vî şerê qirêjî de tu kara gelê tîrk jî nîn e. Ji xeynî wê jî her roj ji jiyana wan pir tiştîn girîng winda dibin. Saet li dora 8'ê êvarê Ekspresa Aştiyê bi rê ket. Di dema hereketê de bi eleqeyeke germ oxirkaran rîwiyên aştiyê şandin. Aştixwazan wekî nîşana aştixwaziyê selikek külîk ji gelê kurd re birin.

Hate daxuyandin ku wê li Enqereyê jî hin kes beşdarî qesfileyê bibin. Di çaxa rîkirinê de şanoger Müjdat Gezen û huner-mend Selda Bağcan jî hatibûn, lê belê ne-gîhiştin Ekspresa Aştiyê. Li gorî planê, tren li kîjan iştasyonê bisikine, wê aştix-wazan li wir çalakîyên ji bo aştiyê pêk bî-nîn û agahî bidin gelê wê derê. Pişt re jî wê ji wan piştgiriyê bixwazin.


Heyeta aştiyê di roja 23'ê avrêl de gi-hîst Amedê û 20 hezar kes ji bo pergîniyê, li iştasyona Amedê civiyan. Li gorî agahiyan dema ku tren digihîje iştasyonê bi destê polîsan provokasyonek tê çêkirin û dûv re jî polîs li kesen ku hatine per-gîniyê didin. Di vê bûyerê de ji sed kesî zêdetir têne binçavkirin, gelek kes jî birîndar dibin. Aştixwazan ew kirina polîsan protesto kir û xwestin ku kesen hatine gitin bîn berdan.

ESNAS MAYA



Ji aliye çepê ve: Müjdat Gezen, Osman Özçelik û Sırri Sakık

TÎSK



BEKIR BAHÖZ

Başûrê Kurdistanê ber bi ku ve diçe?

Wekî tê zanîn her du partîyên mezin li başûrê Kurdistanê, Yekîtî Niştimanî Kurdistan (YNK) û Partî Demokratî Kurdistan (PDK), ji bo du salan şerekî qirêjî li hemberî hev meşandin, ku bû sedema wêrankirina yên mayî ji Kurdistanê. Jixwe piştî Şerê Kendavê dema ku gelê me li Başûr serî hilda, bi niyaz bû ku çewsandinê ji holê rake û zincîrên koletiyê biqetîne û jiyanekî nû bide destpêkirin. Ji bo vê yekê, bi germî û bi dilekî tîjî ji hêvî ve tevî hilbjartînen parlementoyê bû, ku dibihara sala 1992'an de hat lidarxistin.

Gelê me pîr baş zanibû ku her du aliyan jî, bi salan li çiya şerê hev û din kirine û çênedibû wisa zû bi zû nakokiyê di navbera xwe de biavêjin aliye kî bixebeitin ji bo avakirina sistemeke hukmê ku azadîxwazên parçeyên din yên Kurdistanê di bin siya wê de têkoşîna xwe li hemberî dagirkerên Kurdistanê bidomînin.

Lê belê her ji desptêka karê hikûmetê ve, nakokî û dijberiya kevn a di navbera her du aliyan de her ku dihat, lez digirt. Ji bilî bihêzkirina parleman û hikûmeta herêmê, her alî dîkir ku di vê navberê de berjewendiyê xwe bi tenê biparêze û hêvî û daxwazên gel jî, ji bo azadî û demokrasî bin lêvan bike.

Vê rewşê, wisa kir ku ajan û îstîxbaratê dewletên herêmî û împeryalîzm têkevin nava başûrê Kurdistanê, ku wan jî nakokiyê berê kûrtir kirin û rî li ber şerê hundîrîn vekirin. Armanca welatên herêmê ew e rî li ber her hewlîn kurdên li başûrê Kurdistanê ku ji bo avakirina sistemeke kurdî didin, bê girtin.

Tirkîye pir vekirî dide xuyakirin ku, ew tu car destûrê nade dewleteke kurdî ku li "bakurê Iraqe" ava bibe. Mirov bi kurtî bibêje ku pirsgirêkên kevn û nû komî ser hev bûn û bihara 1994'an agirê şerê birakujiyê pêxist. Di cend tûrên şer de, bi hezaran pêşmerge û kesen sivîl hatin kuştin, bi hezaran jî birîndar bûn, her alî jî alîgîrîn aliye din ji herêma xwe qewirand û bi van kirinan re jî, birînekê kûr di laşê civakê de vebû ku bi dehan sal jê re pêwist e, heyâ were dermankirin.

Xwendevanên hêjâ... Helbet rewşa li başûrê Kurdistanê rasterast girêdayî rewşa li bakurê Kurdistanê ye, bi wateyeke din girêdayî têkoşîna rizgariyê ye ku PKK serkêsiyê dike. Lewre heke mirov berê xwe bide çapemeniya tîrkan, rastî du xalan ango du têbîniyan tê: rayedar û siyasetmedarên tîrkan ji aliye kî ve dibêjîn ku şerê de navbera hêzên Başûr de, dibe egera bihêzbûn û bicihbûna PKK'ê li herêmê û bi ya wan pêwist e ev şer raweste, ji aliye kî din ve ji Tirkîye naxwaze dewleteke kurdî li başûrê Kurdistanê ava bibe. Ev yek jî tê wê wateye ku kurdên Başûr ber bi Bexdayê ve biçin û careke din ji Saddam hembêz bikin, ku Amerîka vê yekê nepejîrîne, an jî xwe bi Tirkîye ve girê bidin û mîna gundparêzan şerê PKK'ê bikin.

Heyeta Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê (DYA) ku van rojan çûbû başûrê Kurdistanê , ew mesaja jor ji Enqereyê girt û ji aliye Tirkîye ve jê hat xwestin ku mercen Tirkîye bi ser hêzên kurd de bisepîne. Gelo kurdên Başûr dikarin di bin zordariya Tirkîye de li ber xwe bidin, an jî bikevin eniya Tirkîye? Emê binêrin ka wê rojêne pêş çi ji me re bidin xuyakirin.

Nîşe: Ji ber ku nivîsa nivîskarê me Sîrwan Rehîm di wext de negîhişt me, di şûnê de me ya Bekir Bahoz weşand.

Kurê paşê yê biçük û Pîrê

Min li beriya xwe nihêrî, hebeke kundiran di beriya min de mabû. Min ew heba kundir çand, torê wî heta wî alî dirêj bûn. Ez, bi hespê dîkî ve, em di ser re derbas bûn, cûn wî alî. Min dît hebek genim di devê moriyekê de ye.

Paşayekî sê tene kurê wî hebûn, wexta li ber mirinê bû ji zarokên xwe re dibêje: "Ku hûn diherin nêçîrvaniyê, di ku de diherin herin, di bakur de merin. Wexta paşa dimire, kurê mezîn dihere nêçîrê tiştekî nabîne. Wexta dihere bakur, dinêre xezalek li pêsiya wî ye; di-de ser şopa xezalê. Xezal dikeve hundirê şikeftekê, ew jî dikevê, dinêre pîrek heye. Ew dibêje: "Xezala min hat hundirê şikeftê". Pîrê dibêje: "Ev xezal bi şertan e, kî pir derewan bike, xezal a wî/ê ye, yê din wê bê kuştin." Kurê paşê qebûl dike, dest pê dike: "Sifreye ke bavê min hebû, çiqas kesan li ser nan dixwar dîsa jî hêleke wê pêçandibû." Pîrê dibêje: "Tew tew tew, wexta sifreya bavê min mişkan dixwar, sifreya bavê te jê re nedibû pîne" û pîrê wî dikuje. Kurê paşa yê orte (navîn) dihere nêçîrê. Ev jî xezalekê dibîne, di-de ser şopa xezalê, dinêre xezal kete şikeftekê. Ew jî dikeve şikeftê, dinêre pîrek li wir e, dibêje: "Xezala min hate vir." Pîrê dibêje: "Ev xezal, xezala bi şertan e, kî pir derewan bike xezal a wî/ê ye", ew jî dibêje: "Bira (bila) be."

Kurê paşê dest pê dike, dibêje: "Sîti-leke bavê min hebû, çiqas mîvanen me hebûn, di hêleke de savar dikeliya, di hêleke de tirşik, hêleke goşt dikeliya ji

bo wan, lê hêlek jî vala bû. Pîrê dibêje: "Tew tew tew, sîtila bavê min, bizmarêk tê re diçû, ew sîtila bavê te jê re nedibû pîne." Pîrê wî jî dikuje, kurê paşê yê biçük derdikeve nêçîrê, dihere hêla bakur. Ew jî dinêre xezalek heye, di-de ser şopê. Lê dinêre xezal dikeve şikeftê, dihere şikeftê, dinêre pîrek li wir e û jê re dibêje: "Xezala min hate vir". Pîrê dibêje: "Ew xezal a bi şertan e, kî pir derewan bike, xezal a wî/wê ye."

Ew jî dibêje: "Bira be" û dest pê dike. Dibêje: "Çil petek mîşen bavê min hebûn, min bi hev re yek bi yek dijmartin, dikirin petekan, min ew yek bi yek dijmartin, sibê derdixistin derive. Rojekê min nihêrî mîşekê nigê (ling) wê kût (qop), winda ye. Ez li hespê xwe yê dîk siwar bûm, cûm lê bigerim. Min li paş kuçeyekî dît ku cotariyan mîşa min ser jê kirine, goştê wê par ve dikin. Ji min ji wan, çil (40) tilm genim dane min. Min genim rakir, li pêş min bû behr, min kevirkanî derxist, min genimê xwe heb bi heb avête wî alî behrê. Min li beriya xwe nihêrî, hebeke kundiran di beriya min de mabû. Min ew heba kundir çand, torê wî heta wî alî dirêj bûn. Ez, bi hespê dîkî ve, em di-de ser re derbas bûn, cûn wî alî. Min dît hebek genim di devê moriyekê de ye. Ji min, ji moriyê, heba genim di ortê de jê



bû. Ji nîvê hebê, min çil teneke helaw çêkir, min teneke li pişta dîkê xwe kir, bire mal; min danîne mal, min dît pişta dîkê min birîn bûye, min li derdê bi wî ketî pîrsî, gotin: "Dermana wî gûza hîndê ye û kalekî li gund e, wî kalî di heft saliya xwe de gûzek xwaribû."

Ez cûm cem kalê reben. Kalo got: "Li nav diranê min binêre", min nihêrî, destek hundirê gûzê min jê derxist. Min bir li pişta hespê dîk kir. Min dît li ser pişta dîkê miş dareke gûza hîndê mezin bû. Wê goz girtin, vê çaxê zarokê gundê me kevir avêtin, tam tune bû. Min wê çaxê anî dara xwe qut kir. Şûna dara min bû erdekî bi çar kîlan

mezin. Min her der ji xwe re kir zebeş. Ji wextekê dûr şûn de ez, tajî û bojiyê xwe, em cûn nav zebeşan. Min li zebeşekî mîze kir û kér lê xist, kîra min cû hundirê zebeş, ez, tajî û bojî li dû cûn, lê em ci bibînin. Min li wî alî nihêrî heft tajî didine ser şopa heft kergûyan e. Li aliyê din nihêrî heft teyr in didine ser şopa heft beytikan e, min li aliyê din nihêrî heft siwar in didine ser şopa heft xezalan, min li aliyê din nihêrî, min dît heft hesinkar in sîtilen xwe çedîkin, dengê çakûcê wan naçe hev û din." Wî çîroka xwe qedand, tiştekî ku pîrê bigota tune bû, wî anî pîrê kuşt.

HAKKI FIRAT

Ji Botan çend gotinê pêşîyan ên kurdan

- *Dema higavtina kerê têt firavina cotyarî dixwit.
- *Heta mirov li ser destan negerit, qedrê piyan nayêt zanîn.
- *Bi eşqên mewîjan dil diçit guwîjan.
- *Nanê genim li xizanan heram e.
- *Ruvî kuriya xwe dikit şahid.
- *Mirov sa didit xatîre xudan.
- *Herçî nekit bi ya mezinan, dê reh bêt wekî bizinan.
- *Biharan xwe şîl nekin, payîzan xwe gêro (meşgûl) nekin
- *Hişyar ji dînan xenî in.
- *Mar ji pûngê nexweşe, pûng cû di der kuna mar de rist.
- *Mêhvan ji mîhvanî nexweş e, xwedîyê malê ji herduwan nexweş e.
- *Here milet, bigre edet.
- *Tişten ne ser ve wekî qûna ji der ve.
- *Li pira nemerdan neçe, bila av te li ber xwe bîbit.
- *Li ber siha şeran binive (raze) bila şer te bîxit.
- *Av a xurt ser evraz diçit.
- *Destê vala li ser zikê birçî.
- *Nanê xwe bi destê nanopêjan bipê-
- je, bila du nan zêde biçit.
- *Gîsk a giro diçit, serê kaniya esli av vedixwit
- *Çi dikit karê, ew têt xwarê.
- *Kefa destan reş nebit, tama devan xweş nabit.
- *Kesê ne li govendê fit reqas e.
- *Pîrê hêvî nedikir dê şû bikit mehr ji telaq dikir.
- *Tu nîmetên bêzehmet nîn e.
- *Nîvkarê salê yekî ka bir, yekî ga bir.
- *Dê û dotan ser kirin, bêeqilan bâwer kirin.
- *Şerê li binî darê çêtir e li bênderê.
- *Şevêñ tarî hêj li hingorî kîfîş in.
- *Goştê mirovîn xwe bixwe, hestîyan ji bo xwe bîhêle.
- *Reh berdan hêsan e, lê kurkirin zehmet e.
- *Demê pisîk ne li mal e, navê mişk ev-direhman e.
- *Kesê masiyan bigirit, dê qûn lê şil-bîbit.
- *Seriye li ber minetan bila biçit nîv zê-retan.
- *Bixwe bi gurikî, rabe bi mîrikî.
- *Sivanê xerab dizanit, pez ku derê ve diçit.
- *Paleye xerab dasan diguhere.
- *Kesê dîzikan çêbîkit, d zane çembil ku derê ve bikit.
- *Derbê hirça kevir e
- *Yekî rez nebû, masle çêdîkir.
- *İşa bike bi esas da dil nekit wise-wis. (endişe)
- *Eger te girt neberde, eger te berda ji pê nekeve.
- *Kes nabêjît mastê min tîr e.
- *Ber li cihê xwe biqedr e.
- *Dîlop bi xwe cihê xwe çedîkit.
- *Mih bixwe û bizin bixwe, her kesek bi emelê xwe.
- *Şuxulan pîr bike, lê ji bîr neke.
- *Zerya bi dilopan naqede.
- *Kî diwêre bêjît şer: Behn ji devê têt.
- *Mala maxoyî li malxo heram e.
- *Diz û malxo bûn şîrîkêñ hev, gayê reş di rojînê li hewa xistin.
- *Yê têr hay ji yê birçî nîn e.
- *Kesê ne li malekê nîzanit hewale-kê.
- *Eger tu kes bi qisek bes e.

Masle: Dezgehê dimsêkirinê.

BERHEVKAR:

RÊBER RONÎ / GOYAN ŞIRNEX

'Ken û Girîn' û 'Girtî'

Caxa ku rê li ber tiştekî neyê girtin, ew bi hemdê xwe diqewime, diperise û pişt re jî digihîje. Lî, heke rê li pêşiyê bê girtin, ew tiş bi hemdê xwe çenabe, ji derve ve têkî lî lê te kirin. Her wiha ew tiş (çî dibe bila bibe) an di wan mercan de, ew mercen bi asteng, ji bo ku çêbe li ber xwe dide, an jî li rewşekî musait digere.

Îcar rewşa me kurdan jî wisan e ku ji ber asteng û têlibergirtinan rewşenbîrên me, nivîskarên me, peyâyen çandê berê xwe dane warên biyan, da ku karibin çalakîyên xwe bibine serî û suxreya (xizmeta) gelê xwe bikin.

Amed Tigrîs û Firat Cewerî ji wan mirovan in ku ji welatê xwe dûr, dest birine xwe û di warên çandî de bêrawestan tê dikoşin. Ev her du kes jî, li Swêdê li ber xwe didin ku, di warê çandî de rola xwe bileyîzin.

Amed Tigrîs, ku mamoste ye jî, bi Roman Motkî re di sala 1989'an de xebata xwe ya bi navê "Ken û Girîn" li Swêdê dabûn çapkirin. Ev pirtûk dîsa ji aliye eyñî weşanxaneyê (Weşanên APEC) ve di sala 1994'an de careke din hate weşandin. Weşanxane li ser çapa nû van agahîyan dide:

"Di ser çapa Ken û Girîn ya yekemîn de 4 sal derbas bûn. Di nav van çar salan de gelek tiş hatin guhartin: Teknik, zimanê kurdî, zanebûn û tecrübe-yen me..."

Çapa Ken û Girîn ya yekemîn, di warê pêkenînên kurdî yê nivîskî de, mirov dikare bêje berhemeke pêşin bû. (...)

Me di çapa duyemîn de, gelek guhartin çekirin. Pêkenînên ku dirêj bûn, me kurt kirin. Yênu ku ji pêkenîn bêtir bûyer û metelok bûn, me ew ji çapa duyemîn derxistin. Di şuna yêna weha de, me cih da yênu ku di çapa yekemîn de tune bûn. Her weha me çapa duyemîn ji aliye naverok, cureyên pêkenînê, teknik

û ziman ve jî guhart."


Pirtûk ji aliye wêneçêker N. Alkurdiî ve jî bi wêneyan hatiye xemilandin û xurtkirin. Tê de 185 pêkenok cih digirin û kaxiza spî hatine bikaranîn.

(APEC-Förlag Box 8133, 163 03 Spanga/Sweden)

Pirtûka bi navê "Girtî" jî, ji aliye Weşanên Nûdemê ve hatiye derxistin. Her wiha, xwediyê Weşanxaneyâ Nûdemê jî nivîskar bi xwe ye. Cewerî, di gel nivîsina kurteçirok û helbestan, bi weşankariyê re jî eleqedar e û kovara Nûdem jî, ji aliye wî ve tê derxistin.

Divê mirov ji bîr neke ku ew karê wergeriyê jî dike û hin klasikên edebî yên cîhanî ji aliye wî ve li zimanê kurdî (kurmanciya jorîn) hatine wergerandin. Wekî "Mişk û Mirov" a John Steinbeck, "Bexçeyê Vişne" ya Çexov, "Li Benda Godot" a Samuel Beckett.

"Girtî" cara duduyan e ku tê çapkirin. Cara pêşin



di sala 1986'an de li Swêdê û cara duyemîn jî dîsa li Swêdê di sala 1996'an de tê çapkirin.

Husên Düzen jê re pêşgotinek nivîsiye û tê de di-de xuyakirin ku, hin çîrokên Cewerî li zimanê biyan wekî swêdî û almanî hatine wergerandin. Di gel vê rewşê, dîsa Düzen dibêje ku hin çîrok di radyoyan de hatine xwendin û grûbêni tiyatroyê jî li ser hinan xebitîne.

Ji aliye din ve, em ji vê pêşgotinê hîn dîbin ku çîrokên Cewerî ji aliye Şukur Mustafa ve, bi tipen erebî, di kovarên başûrê welêt (Beyan û Karwan) de hatine weşandin.

Çîroknîvis Firat Cewerî, di berga paşin a pirtûka xwe de, dide eşkerekirin ku çîrokên di pirtûkê de, di destpêka salên 80'yî de hatine nivîsin û piraniya wan di kovarên ku di wan salan de derketine, hatine weşandin. Cewerî li ser sedemê çapa duyemîn wiha dibêje:

"Demeke dirêj di ser nivîsandin û çapkirina van çîrokan re derbas bûye; lê belê bûyeren çîrokan, rewşa zarokên kurdan, rewşa welêt, tirs û zilma leşkeran hé jî berdewam e."

... Digel ku nérîna min ya derheqa forma çîrokê de hatiye guhertin jî, disan ez bawer nakim ez ê iro bikanibim bigîhîjim van çîrokan, germahî ya wan, jidiliya wan."

Firat Cewerî di kurteçirokên xwe de bi rîbaza realîzma civakî bi piranî rewşa zarokên kurdan anîye zimên. Qehreman jî realist in. Bi kurtî, di rewşa Kurdistanê de li ser awayê jiyana zarakan rawestiyaye.

Pirtûk 174 rûpel e û tê de 15 çîrok cih girtine û kaxiza spî û xweşik hatiye bikaranîn.

(Weşenên Nûdem, Termov. 52.2tr 175 77 Jarfalla/Sweden)

ZANA FARQÎNÎ

Ne dereng e!

OSMAN ÖZÇELİK



T u bijîşk î, iro karên te zehf in, wekî her roj. Keça te wê biçe kursa muzîkê, dersên şanê distîne. Kurê te jî diçe antrenmana basketbolê. Divê tu wan bibî deyîn û paşê wan bînî malê.

Nexweş li ofîsa te dipen. Ku tu dereng bîmîn wê biçin ba bijîşkekî din. Iro dawîroja razandina fatûreya elektrîk û têlefonê ye jî. Karê te ne hêsan e. Tu her roj westiyayî vedigerî malê. Jiyana bajarên mezin, bi teşqeleye ye. Jina te dibêje tu rojekê me nabî tiyatroyê.

Tu mamoste yî, karê te gelek giran e. Şeva çûyi, heta derengiya şevê te kaxîzen îmtihanî xwendin. Lewma vê sibehê tu dereng rabûyi. Baş e ku zarokên te bi serê xwe diçin dibistanê. Ku tu bi xebata xwe bala kolejên taybetî bikişînî, dibe ku tu derbasî kolejê bibî. Wê çaxê pêwistiya we ji xebata jinê jî namîne. Ku ew nexebite wê jiyana te ya malê bi rêkûpêktir bibe.

Tu parêzer î, di karê xwe de tu nû yî. Di salekê de mirov baş nayê naskirin. Li pêşiyâ te zewac heye. Kîjan keçen xwende û rind, mîrên bêmal û erebe mehr dîkin. Divê tu bi şev û bi roj bixebeitî. Xwe ji daweyen siyasi bi dûr bixînî. Tu qezenc di vê riyê de nîn e.

Tu jin î, mîr dixebeite, tu li malê yî. Belê karên jinênen malan, ne wekî ku tê gotin rihet e. Şüştina kîncan ú firaqan, malaştina malê, xwarin, zarok hemû li ser pişta te ye. Bes kîfeke te heye; birîna kuponan, ji rojnameyê rengin û di televîzyonê de filmên brezîlî.

Tu rojnamevan î, ji destpêka rojê, heta nîvê şevê, kamera di stûyê te de, tu li dûv nûçeyan î. Tu bi bawer î ku rojekê wê nûçeyen te di rûpelê yekemîn de biweşin. Ü wê nav û dengê te belav bibe. Dibe ku di rojnameyê de quncikekî jî bidin te. Ü wê çaxê wê karta çapemeniyê ya zer li ber te bîgerînîn. Divê tu bes li karê xwe hûr bibî.

Tu xwendekarî, bavê te barkêş e, hûn feqîr in. Diya te nexweş e û zarok hûr in; we gelekî kîşandiye. Pişti ku te xwendina xwe qedand, hûnê bêhneke fireh bistînîn. Tuyê malbatê ji xizaniyê xelas bikî. Divê tu dersên xwe qenc bixebeitî û di zanîngêhê de tu salan winda nekî. Têkîlî xwendekarên beradayî nebî.

Tu siyasetvan î, wa ye partiya ku tu endam î, hate ser hukim. Bergiya te vekirî ye. Bi sedan kes ji bo te bûne endamê partiyê. Ü hînek ji wan jî bûne nûnerên taxa te. Ku tu zêdetir bixebeitî, dibe ku tu bibî berendamê parlementoyê.

Paşê? Paşê Xwedê mezin e. Yênu ku bi riya siyasetê bûne dewlemend, ma ji te biaqiltir in? Ji te re xebateke qenctir divê.

Tu tacir î, tu mîtehîd î, tu dikandar î, tu qesab î, tu şofêr î, tu hakim î, tu notêr î, tu mela yî. Welhasil hûn ji her beşî mirov in. Hûn her yek bi malekê û bi karekî ve hatine

girêdan. We her yekî ji xwe re dînyayeke biçük ava kiriye. An jî ji we re hatiye avakirin. Ü hûn di nav wê dînyaya biçük de bi dûv tişîn biçük ketine. Daxwaza sistêmî ev bû. Ü ew bi ser ketin. Edî hûn ji daxwazîn mezin û mirovî bi dûr ketin.

We bêhna kuşîlîk zozanan, we tama şîrê miha gewr, we firo ji bîr kir. Gelo ev çend sal e ku dengê bilûrê neketîye guhêne we? Lê dengbêj, govend, dîlan?.. Ya herî xerab we zimanê xwe ji bîr kir. Di geremola bajarên mezin de we, xwe winda kir. Ci heyf! Ci heyf!

Di dibistanê de ji we re digotin bibêjin: "Ez tirk im, rast im, xebatkar im..... ez hebûna xwe diyarî hebûna tîrkan dikim..." We hay ji xwe heye? We hebûna xwe diyarî kiriye. Ma qey hebûna we ji we re bûye şermekê mezin?

Hûn li ser asîmanê welatê xwe dengê top û balafiran nabihîzin? Qırceqirça dengê agirê ciyayê we, yêne dişewitin nayê guhêne we? Hûn nabînin, bêrîvan ji guhanêni mih û bizinan edî xwînê didoşin.

Kes ji we şer naxwaze. Ma hûn nikarin aştiyê jî bixwazin? De rabin serê xwe ji qule derxin, paçen di guhêne we de derînîn. Guh bidin dengê mirovatiya di kûraniya dilê xwe de. Axa miriyan ji ser xwe biavêjin.

Li derveyî dînyaya we, dînyayeke birûmet heye. Gelê we li hêviya we ye. Ez bawer dikim wê bi evîni we hembêz bikin. Ji bo destpêkê nedereng e. De rabin biçin navendeke rojnameyeke kurd, biçin navendeke çandî ya kurd, biçin HADEV'ê. De rabin, tîrsê bişikînin... Ne dereng el...

Xwedê di şûna qıruşekî de hezar qıruşî dide, lê...



Li gundekî, bi navê Şemo mirovek hebû. Rojekê Şemo diçe mizgeftê ji bo nimêja iniyê, guhdarî mele dike. Mele dibêje eger kî qirusek pere bide yekî feqîr, wê rojek were ewê li şûna wî qirusî ewê hezar qirusî bigire.

Şemo carek difikire û dibêje xwe ku ji wî karî baştir tu kar nîn e. Di beriya wî de zêdeyî qiruşekî tune bûye. Gava ku ji mizgeftê tê der, li ber deriyê mizgef-tê parsek hebûne. Şemo qiruşê beriya xwe derdixîne û dixe destê parsek û diçe mala xwe.

Zarokên Şemo li hêviya bavê xwe ne ku bavê wan ji wan re hinek xwarin bîne. Lê zarok dinihêrin ku bavê wan destvala tê. Zarok û dayika wan gelek xemgîn dîbin û bi Şemo re dixeyidin.

Şemo jî dibêje wan ku hal û mesele ev e. Wî qirûşê xwe daye feqîrekî. Li ser vê zarok hêrs dibin û dixwazin li Şemo bixin. Şemo ji malê derdikeve û diçebi çola geleki dûrî gund dikeve..... Mêze dike ku da-reke mezîn, bilind û li binê darê kaniyeke hênik û av-şîrin heye. Dibêje xwe ku wê li wê derê hinekî bêhna

xwe bide

Ew misilman dibêjin Mihemed heye, Alî heye, Xwedê heye. Ne ev derd û kulên me ji wan in? Ezê hemûyan bikujim. Bila hemû însan azad bin.

Semo jî li ser darê, li wî siwarî temase dike

Gava siwar kêra xwe dikişine û di erdê dide dibêje: "Min Mihemed serjê kir."

Car din kêra xwe di erdê dide dibêje: "Min Alf ji kuşt." Cara sisîyan dibêje: "Ezê Xwedê serjê bikim." Gava kêra xwe radike, Şemo li ser darê dibêje: "Ew Xwedê bikuje ka kî wê hezar qirûşê min bide min?", û li ser darê tivinga xwe berî serê siwar dide. Siwar, dimire, diçe ser cendekê siwar. Li berî û kîsê siwar mîze dike ku tam hezar qiruş di kîsê siwar de ye. Şemo hema bilez tê mal dibêje:

– Jinik em dewlemend bûn

Xengîniya wan li ser wan radibe, kêfxweş dibin û Şemo destûra xwe dixwaze, dibêje ku wê here miz-geftê destmêja xwe bike.

Diçe mizgeftê ku mele dîsa weaza qiruşan dide û dibêje: "Kî qiruşekî bide feqîrekî ewê li şûna wî qiruşî roj wê were ku hezar qiruşî bigire." Şemo destê xwe radike: "Meleyê min, rast e. Xwedê li şûna qiruşekî hezar qiruşî dide, lê heta ku mirov tetikê tivingê nekisîne nade."

HESEN DUDIL

XELAT...

XACEPIRSA BIXELAT (15)

XACEPIRSA

Conciencia creativa y creativa	W	Wayne Wright	W	Wimberly Wimberly	W	Wimberly Wimberly	W	Wimberly Wimberly	W	Wimberly Wimberly
Guillermo	G	GUILLERMO	G	Guan	G	Guan	G	Guan	G	Guan
Julián	S	SEZAR	S	Sedzor	S	Sedzor	S	Sedzor	S	Sedzor
Gaspar	G	GASPAR	G	Gaspar	G	Gaspar	G	Gaspar	G	Gaspar
Luis Fernando Gutiérrez	A	AKTO	A	Akto	A	Akto	A	Akto	A	Akto
Magaly	N	ANE	N	Ange	N	Ange	N	Ange	N	Ange
Túmulo en el agua	R	RAM	R	Ramón	R	Ramón	R	Ramón	R	Ramón
Reyes	E	REYES	E	Reyes	E	Reyes	E	Reyes	E	Reyes
Rodríguez	R	R	R	Rodríguez	R	Rodríguez	R	Rodríguez	R	Rodríguez
Olkajero	N	N	N	Nikolajero	N	Nikolajero	N	Nikolajero	N	Nikolajero
Óscar	A	ALTA	A	Alta	A	Alta	A	Alta	A	Alta

Bersiva Xaçepirsê (13)

Xaçepirsa me bixelat e.
Di 15 rojan de ci bersiv bigihijin me
emê wan binirxînîn û bi riya pişkê
li 10 kesan belav bikin. Xelata
1. jîyan 1. 12. jîyan 1. 13. jîyan 1.

Koma Ained
“Agir û mirev” e


Jêrenot: —
Ji bo ku bersvia we bê nirxandin,
divê hûn "Peyva Veşarı" di nava
qutiyên li bin xacçepirî de binivisin
î teví adresa xwe ji me re bisinîn



Saireki navdar (Wêne)		Kur Paytexta Ermenis-tanê	6	Gihane-kek	→	Baş. pak	↓	.Reşo yek ji pê-sévanê PDK'ê	1	Salar ú... (Ceger xwin)
Nûce			4	Baqir	↓	Notayek	↓			
	←→				Püt Plaqeya Afrîkaya Navin	→	↓			↓
İstişare	→		5				↓		Notayek	→
Kal									Pasgirek	
	←→			Sembola Skandi-yûmê Dayik	→	Ériş Xwedi-kirina pez	→			↓
Çav	→			Lê genim dihérin Zirkon-yûmê	→		↓	Qral	→	
Azine, metod								Naveke jinan		
	←→		3		Pasgirek Xwediyyê gund	→			Bikêf	→
Êma sewalan	→			Şirove	→		↓			
Çükek				Ol						
	←→				Nepijandi Notayek	→				
Bajareki tirk ku kurd lê gelek in		Beşek ji zimanê Îndo-Evrûpa	→		↓					
	2					Rojek	→			

PEYVA VESARI





Êşa teriyê

Di destpêka meha avrêlê, di rojnameya Yenî Yüzyılê de Coşkun Kırca bi navê "Perwerdehiya bi Kurdi?" (Kürte Eğitimi mi)? rêzenivîsek da weşandin. Di vê rêzenivîse de Kırca nîşanî me da ku ew, birastî ne bi serê xwe dinivîsîne. Ji ber ku ew berdevkê şerxwazan e û wezîfeya wî jî di Yeni Yüzyılê de nîşandîn e. Ji ber vê yekê wî jî ev rêzenivîs amade kiriye.

Heke ku ev idia ne rast be, emê jê bipirsin: "Tu ne zimanzan î, ka tu çawa li ser vê mijarê ewqas aqlmendiyê dikî? Niha, heya îro li ser vê mijarê xebateke te heye; gelo te çima heya îro bi kar neamî?" Ji ber ku ew der heqê zimanê kurdi de dibêje: "Ev ne ziman e, tu peyveke wan tune, bi wî zimanî du kes jî nikarin bêñ cem hev û bi hev re têkiliyê deynin ..."

Îdiaya yekemîn: Kırca dibêje kurdi ne ziman e. Heke ku ne ziman e ma çi ye? Mantiqî wê heye an tune? Di aliye din de werger pêk tê an nayê? Şertên bûyîna ziman çi ye? Gelo tu tiştîn ku tu kes pê nizane, tu behsa wan tiştan dikî? Heke na, ku tu li ser gramer, sentaks û disiplinê rîzimanî tiştin dizanî ji me re jî bibêje ku em jî pê bihesin. Lîkolînê we çi ne û eger xebat û berhemêne we hebin, çima hûn wan eşkere nakin?

"Ku ziman bûya, gerek di dîrokê de berhemêne nîşîski pê bihatana amadekirin. Lê belê tiştîn wisa nikaribûne pêk bînîn". Di vir de sextekariyeke mezin heye, lê belê Coşkun Kırca ku bixwaze dikare berhemêne ku bi kurdi hatine nîşandîn, bi dest bixe. Ji ber ku Ehmedê Xanî di sala 1650'yan de berhemêne xwe Mem û Zîn, Aqida Îmanê, nîşandibûn û ji xeynî van bi navê "Nûbar"ê ferhengeke kurdi-erebî ji bo zarokan amade kiribû. Lê di wê demê de zimanê tirkî ne wekî zimanê îro bû.

Heke ji bo nîşînen Kîtabeyên Orhun bê gotin, em bi hêsanî dikarin bibêjin ku ew ne zimanê tirkîya îro ye. Nêzîkbûna tirkîya îro û Kîtabeyên Orhun mîna nêzîkbûna îngilî-

Coşkun Kırca ku bixwaze, dikare berhemêne ku bi kurdi hatine nîşandîn, bi dest bixe. Ji ber ku Ehmedê Xanî di sala 1650'an de berhemêne xwe Mem û Zîn, Aqida Îmanê, nîşandibûn û ji xeynî van bi navê "Nûbar"ê ferhengeke kurdi-erebî ji bo zarokan amade kiribû.

zî, Fransızî û ji latînî ye. Ev çiqas li hev dişibin, tirkî jî ewqas dişibe Kîtabeyên Orhun. Ev jî nişan dide ku îdiaya Kırca bê bingeh e.

A duymîn jî Kırca dibêje: "Tu peyveke wî zimanî tune." Gere em jê nepirsin; ha Kırca! Ka bibêje xebata te ya li ser zîmîn çi ye? Gelo tu ji ku dizanî ku ev peyv hemû ji zimanê erebî, farisî û jî tirkî hatine standin. Ma tu bi çi awayî xwe li ser vê mijarê mafdar dibînî? Ka xebata xwe ya li ser zimanê erebî, zimanê farisî û tirkî nîşanî me bide? Heke ku tu xwe di wî warî de pispor dibînî, lazim e ku tu van ziman, ji aliye qanûnê lengüstîk ve wekî zimanzan bizanibî.

Ji bo bikaranîna hin peyvîn erebî û farisî, ziman ji zimanbûna xwe tu car derna keve. Ku wisa ye, ka were pêşî em ferhenga tirkî binirxînin û pîvana bejna xwe bibînîn. Îcar tu ku nizanibî, tê gotin ku ew kesen wekî te şarlatan û derewîn in. Gelo derewîn i?

A sîyemîn: Kırca dibêje: "Bi wî zimanî têkiliya du kesan jî ne mimkun e". Bi rastî, dema ku em vê hevokê ji pisikîn kurdan re wergerînin, ewê pê bikenin, ji ber ku em tirkî destpêka dibistanê de hû (hîn) bûn, he ta wê demê me di navbera xwe de gelo bi çi zimanî xeber dida?

Xeynî vê, divê mirov ji C. Kırca bipirse, "Gelo hemû kurd bi hev re çawa têkili datanîn?" Pêwist e ku Kırca bi awayekî mantiqî bersiva vê pîsê bide. Heke ku ev tirkî ye, çima ji me fêm nakin? Gelo em ne tirk bin? Heke wisa be, Kırca û hempayêne wî kî ne, ma ew ne tirk in? Wisa xuya dike

ku terciha Kırca ye, di wî warî de tu tengasiya me nîn e.

Bila ew ji problema xwe re bigirî. Kırca, dûv re van gotinê xwe hemû ji bîr dike û dibêje: "Lê ka bibêjin em kîjan şeweya (kurdi) wî zimanî li dibistanan biparézin? Divê ev bê dîtin. Pişt re jî divê ev biryara bi destê dewletê were tesbitkîrin".

Ka mîze bikin xwendevanê hêja, hûn ji vê gotinê gelo ci fêm dikin? Ma kurd di wî warî de ci dixwazin? Ji ber ci ewqas işkence û ceza xwarin?

Ji ber ci kesen ku van tiştan tînîn zîmîn, kesen wekî wî camêri digitine wan "Ew kes xayîn û dijminê komara Tirkîyeyê ne." Ka îro kî xayîn e de bibêjin? Kırca li cihekî jî dibêje: "Ji bo çareseriya van probleman, di bin destê dewletê de, divê kurs bêne vekirin."

Ku kurdi ne ziman e, gelo kursa ci vedi be? Însaf ... Îcar te nedigot ev ne ziman e? Ku ne ziman e tu kursa ci didî vekirin?

Di vir de jî kifş e ku, ev nîş bi lez û bez dane nîşandîn, ji ber ku bêhna apoleten leşkerî û şerxwaz jê tê. Ev jî, em dizanî ku êdî rewşke wisa ketiye ber MGK'ê ku xwe mecbûr dibîne gavekê biavêye. Lê belê dewlet di nav xwe de bûye du alî. Pêwist e bê zanîn ku, şerekî mezin di navbera wan de diqewime, êdî kî bi ser bikeve. İşaretên siyâsî û rewşa Tirkîyeyê jî aşîfixwazan dide nîşan. Gotin û gefen Coşkun Kırca ji ber vê yekê ne.



Alîgirê aştiyê destê xwe dan hev û bang kirin:

Dewlet bila bersiva agirbestê bide

Roja yekşemê ji bo taqîkirina "Mitîng Aştiyê" ez bi wapûrê derbasî wî ali, yanê Kadiköyê bûm. Hê ez li wapûrê bûm ku dengê bi deh-hezaran însan xwe digihandin çarmedorê Stenbolê. Ev deng, dengê wan însanan bû ku bi dehan salan e birçiyê aştiyê û demokrasiyê ne.

Piştî ez ji wapûrê peya bûm, bi coś û

heyecaneke mezin min xwe gihad cihê

mitîngê (Îskeleya Kadıköyê). Bi deh-hezaran însan beriya ku mitîng dest pê bike, gihiyabûn meydanê. Ez hilkişiyam ser Otobusa HADEP'ê, heyecana min hê zêdetir bû, çunkî ji çarmedora meydanê însan mîna lehiyê diherikîn wê derê. Her diçû hejmara aştiwazan zêdetir dibû. Her birên ku xwe digihandin meydanê, dihatin anonskirin, piştî anonsê ji tofana cepikan dest pê dikir. Ev, ji ber kîfxweşîa hatina ba hev bû. Her çiqas bi salan e ku dewlet dixwaze

rê li ber aştiwazan bigire jî, careke din hate nîşandayîn ku ev yek ne mimkun e, lewre gel her tim alîgirê aşti û demokrasiyê büye.

Ma kî tune bû di vê mitîngê de? Ji heft saliyan bigire heta 70 saliyan; jin û mîr, pîr û kal, zar û zêç tev de hatibûn ku dengê xwe bi dengê kesên din re bikin yet. Heta ew bûk û zavayê ku ker û lal bûn jî, ji ber girîngiya vê rojê wekî mesajekê, li wê meydanê zewicîn û bi işaretet serkeftinê silav dan aştiwazan.

Murat Bozla, Kemal Parlak, A. Melek Fırat, Ercan Kanar, Siyami Erdem, Ahmet Türk, Ferhat Tunç û hwd. mesajîn aştiyê dan gel û bi giştî xwest ku ev şerê qirêj bisekine û dewlet bersiva agirbesta PKK'ê ku ev çar meh û nîv e didome, bide.

Li aliyê din, Berdevka Grûba Keskan a Parlementoya Ewrûpayê Claudia Roth, ji ber kirinê dewleta alman, lê-

borîna xwe ji gelê kurd xwest. Wê got: "Bi firotina silehan dewleta alman piştigiriyê dide vî şerê ku li dijî gelê kurd tîz meşandin."

Di vê mitîngê de tiştekî xweş jî ew bû ku, dayikîn gerîla û leşkeran destê xwe dabûn hev û bang dikirin: "Em vî şerî naxwazin, édî bes e bi xwina zarokén me ciya ién avdan. Tansu Çiller a ku alîgirê şer e, kurê wê li ba wê leşkeriyê dike, yêne me jî li şerê ciya xwîna xwe dirijînin. Divê dewlet bersivê bide agirbesta PKK'ê ku di 15'ê Berfanbarê de ilan kiribû. Ev şer wê heta kengê bidome. Dengê me sultanê ker bihîst, lê hikûmetê nebihîst."

Belê hikûmetê dengê aştiwazan mi-xâbin nedibihîst. Lê axaftvan bi giştî anîbûn zimên ku, "Ev deng wê Enqereyê bihejîne."

Di vê mitîngê de tevî pankartê HADEP'ê, ku wê ev mitîng amade kiribû,

pankartên mîna: "Edî bes e, dayik bila negirîn", "Ji şer re şer, ji aştiyê re aşti", "Pirsîrîka kurdan ne tenê ya kurdan, ya tîrkan e jî" û hwd. hatibûn hîldan. Tevî posterên Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, alîn ARGK û ERNK'ê hatin vekirin û pankartên Attilim, Özgür Halk, YXK, Odak, Kaldıraç, Fabrika, Ekim, Kızılbayrak, Hedef, Zülfikar, Roj hatibûn hîldan.

Du pankartên ku maneya mitîngê di-anîn zimên ev bûn: "Ez dayika leşkerîkî me. Bila dawî li şerê qirêj were û ez aştiyê dixwazim" û "Di şerê qirêj de, ku ez bimirim, tu bimîri, em bimirin, wê kî bijî, di vê cografyaya delal de."

Piştî vê mitîngê, bi amadekariya İHD'ê, "Trena Aştiyê" ji Stenbolê rabû û ber bi Kurdistanê hereket kir, ji bo ku dengê aştiwaz ên li vê cografyê bigihîne hev.

AYNUR BOZKURT